



M. Nureddin Yekta kî ye?

*Di 24.03.1957'an da li
bajarê Mûşê hatiye dunyayê.
Di biçûkîya xwe da dest
bi dibistana seretî û ilmê
medresê kîr. Piştî dibistana
seretî di medresanda
xwendina xwe domand.*



*Bi medresê ra jî, him lîsa Îmam-Hatip û him jî
Sosyal bîlimler xwend.*

*Di 29.09.1978 di Diyanetê da dest bi wezîfê kîr û
di sala 1994'an da jî, dev jî wezîfa Diyanetê
berda.*

*Di despêka sala 1997 derbasî Almanya bû. Ta
niha bi sedan nivisarên wi di kovar û malperên
internetê da û heft heb jî pirtûkên wi hatine
weşandin.*

Pirtûkên wi:

- 1- Elifba Quranê û Tecwid (kurdî û erebî)*
- 2- Kuran Elifbasî ve Tecvit (türkçe ve arapça)*
- 3- Gundîyê (Helbestên xortanî)*
- 4- Sevdam bir güle (gençlik şiirleri)*
- 5- Pêkeniyên kurdî*
- 6- Ummetin Mazlumlari kurdler ve Kurdistan*
- 7- İslam'da Irk sorunu ve kurdler*

Pêkeniyên kurdî

Muhammed Nureddin
Yekta

Pêşgotin

Gelê Kurd gelekî dîrokî ye. Xwedan çandek dîrokî û edebî ye. Rûsipî yê me, pîr caran meramên xwe bi helbest, çîrok û pêkeniyên tînin ziman. Jiber bi taybetî di pêkeniyanda mirov him dikene hîm jî, ji vê pêkeniyê dersekê digire ji xwe ra.

Min xwest ku hin pêkeniyên di nava gel da û hin bûyerên di jiyana min da hatine serê min, an ez rastê wan hatime, hemiyên binvîsînim ku ji çanda me ra bibe alîkarîkî.

Bawer im, di jiyana me gelek da bûyerên ku him mirov pê bikene, him jî jê dersê hilîne hene. Belku îmkana me hemiyên tune, ku em wek pirtûk an wek vidoeyek bikin xizmeta gelê xwe.

Di van pêkeniyên da caran hin bêje yê di dinava civakê da wek argo tînin qebûl kirin hene, lê çî bikim ew jî parçekî ji jiyana mene. Hêvîdar im xwendevan vana jî bi maqûlî bipejirînin.

Di çand û kultura me da, evana jî ciyê xwe girtine. Bi hêviya bi dilên we be.

Silav rêzên xwe pêşkêş dikim.

M.Nûreddin Yekta

Acela min tune

Xalisê Baybûrdî ji Stenbolê bi trenê diçû Erzurimê.
Camêr bilêta trena postê sitendibû lê sarê Expressê
bûbû.

Dema kontrolkerê trenê bilêta wî dît, di nava wan da
sohbetek wiha derbas bû.

- Xalo tu sarê trena şaş bûyî, va bilêta postê ye, lê
tren expres e.

* Berxê min çî ferq heye herdu jî tren nînin?

- Bilêta expresê biha ye, posta erzan e!

* Ma ez çî bikim? Karê dewletê ye!

- Xalo xwe nexapîne, an ferqa bilêta bide, an jî peya
be sarê postê be

* Lawo ez fêm nakim, ma çima herdu jî tren nînin
çima yek biha ye?

- Belê herdujî tren in lê va zû diçe, posta hêdî diçe.

* Ew karê min nîne birarzî, karê makinîst e!

Lê tu acela min tunê, bêje makinîst bila wek postê
hêdî hêdi bajo!

Adetên xirav

Li gundekî adet bû ku heya qîzek derneketa serê xanî (ser banê) wek pisîka nenewîya kesî wê qîzê nedixwest. Madem ku adet bû eyb jî nebû. Kijan qîza temenê (umrê) wê dibû 14-16 salî, derdiket diharê xanî û dinewîya. Roja pey wê xwazgînî yên wê dihatîn.

Li gund keçek gelek bedew û delal hebû, bi xwe guman bû, digot ez dernakevim ser xanî û vê adetê jî, ji gund radikim.

Sal ser salê da derbas dibûn, hevalên wê hemiyar mên kirin, zewicîn bûn xwedî mal û zarokan lê keça me hêj di mal da ye. Umrê wê bû bîstûheyşt (28) sal. Kesek ji bonê nahat. Keçikê dît fêde nema, umir diçe û xwazgînî naynê. Halhale keçik pirr jî delal bû. Mixabin adet pêk nedihanî.

Rojek fikirî got wiha nabe, ezê di mal da bimînim.

Rabû derket ser xanî bi dengê bilind qêrîya.

"Miyaaaaaaaawwwwwwwww

gundinao min di gora bavê we û heftê bavê we

da rîno bi ser adetên weda de haydê

miyaaaawwwww"

Dilê we rehet bû?

Roja dîn 28 xwazgînî yên we hatîn!

Berê xwe kuva kim?

Mirovekî hat bal Îmam Ebû Henîfê jê pirsî got:
"Dema ez cilên xwe ji xwe derxim û bikevim avê daku
xusla xwe hilînim. Gelê ez berê xwe kuva bikim?"

(Yani ez berê xwe bidim alî rojava, an rojhilat, an
qiblê, yanî li kêjan aliyê binhêrim.

Îmam Ebû Henîfe got:

Baş ew e ku tu berê xwe bi alî cilên xweda bikî, ji boy
kes cilên te nedize!

Ezraîl çawa ruha distine?

Rojekê ez û Seydayê Mela Mehyeddînê Domê li ber derê qehwa wî runiştîbûn, me çay vedixwar.

Camêrekî ji wêda hat, li me silav kir got:

- Hun du heb mela runiştîne pirsek min heye ji we.

Seyda got "Hecî çaya xwe vexwe here, pirsane neke.

Çay ji hecî ra hat, çaya xwe vexwar lê dîsa got:

- Heyra ez fêmanakim demên berê dema yek nexweş diket, mehek di bin sekeratê da dima paşê dîmir, niha hima dibê ay oy û diçe va hîkmetê wê çiyê?

Seyda li çavên min nêhêrî.

Min got "Seyda ciyê tu lêbî ez deng nakim."

Seyda kenîya got hecî "demên berê elektrîk tunebû, teknîk ewqas pêşda neçûbû, Ezraîl bû û darê xwe.

Dema diçû ser nexweşa bi dara lêdixist heya bimira, hinek ji wan zûbizû can nedidan, lê niha du heb kablo pêra ne û li hemî malan jî elektrîk heye. Dema diçe malekê kabloyê bi ser û lingên nexweşva girêdide û elektrîk didê, loma wisan zû dimire.

Heciyê me hinek fikirî got:

"Erê wellah, vaxê ket serê min û rastiya wê jî wisa ye, de bixatirê we."

Heciyê me çû, Seyda dîsa li çavên min nêhêrî kenîya û got "çawaye?"

Min got "bê qisûr bû Seyda Xwedê ji te razîbe."

Ev çî rêx bû me xwar?

Axa yê gund pirr maldar bû, bi kerî û sûriyan pez û dewarên wî, xizmetkar û qewraş, kole û xulamên wî hebûn!

Rojekî ew bi tevî xulamekî xwe va diçin nêçîrê, di ber zevîkî da derbas dibin û dinhêrin ku xwediyê zeviyê hinek rêx li ber zeviya xwe valakiriyê. Axa difikire, ji xulamê xwe ra dibêje:

-Kuro lawo tu dikarî hinek ji vê rêxa hanê bixwî?

Xulam şaş dimîne û bersiva axê dide;

-Axa yê min, ma ne şerm e ku mirov rêxê bixwe?

Axa dixwaze ku rêxê bi xulam bide xwarin, dibêje:

-Kuro tu ji vê rêxî bixwî ezê dused (200) pez bidim te!

Xulam hinek difikire, dibêje "ez xulamekî me, malê min tune û ez hinek ji vê rêxa bixum wê çî bi min bibe? Hinek dilê min wê lihevkeve, ezê çend rojan nexweşkevim û dûv re baş bibim. Lê wê malê minê pirr be û ez heta sax bim, ji kesî ra xulamiyê nekim".

Dibêje:

-Belê axa ezê bixum! Diçe ber rêxê û çenga xwe lê dixê û dixwe. Hinek vedireşe û dûv ra ew axa dîsa diçin nêçîrê. Lê bi rê da her du jî qet xeber nadin, her du jî difikirin.

Axa difikire; "Ma gelo min bi vî rêx da xwarin ka min çî qezenc kir? Dused pezê min çû, xwezî min tiştêk awa nekira, lê ku ez poşman bibim xelkê ji min ra çî bêje? Ji axatiya min ra dest nade. Malê min çû lê ji bê aqiliya min bû"....

Xulam difikire; "Gelo xelkê ji min ra nebêje ka te vî malî ji ku anî?

Ji xwarina rêxê!.... Heta ku ez sax bim li dunê wê ji min ra bibe şermekî mezin, baş ew e ku ez xwe ji vî rêxxwarinê xilas bikim." Bi hev ra şûn ve tînê ber wê zeviyê. Xulam dizvire ser axê û dibêje:

-Axa yê min te bê sedem malê xwe da min, were em bazarekî din bikin, tu hinek ji vê rêxê bixwe, bila dîsan malê te ji te ra be!

Axa ji xwe evî dixwest ji Xwedê, ji xulam re got:
-Kuro tu soz bidî ji kesî ra nebêjî, ez qebûl dikim.
Xulam soz dide û diçin ber zeviyê, axa jî destê xwe lêdixe û hinek ji rêxê digire û dixwe.

Pişt re bi hev re tînê gund ber derê mala axê, xulam dibêje :

-Axa, vê sibê dema em çûn nêçîrê ez xulam tu axa bûy, ez feqîr tu dewlemend bûy, lê niha dîsa mal yê te ye û dîsa ez xulamê te me, her tişt dîsa wekî berê ye, ne wisa?

Axa dibêje;

-Belê wisa ye.

Xulam dikene û dibêje:

"Madem em dibûn wekî berê lê ev çî rêx bû me xwar?"

Bereketa dew!

Mêvan hatibûn mal, lawik bitev diya xwe ve liser xwarina mêvanan diaxivîn.

- Dayê ka em çi bidin mêvanan? Di mal da tu xwarinek me tune

- Berxê min nanê me heye û dew heye, duh min teştêk nan pijandibû.

- De baş e hima dew hindik e.

- Na lawo!.. Bereketa dew, di dest diya te da ye. Heta kaniya me nemiçiqe dew jî naqede!

Deng ji kuva tê te?

Dibên ku mirovekî hebûye û duheb jî jinên wî hebûne. Jina mezin pîrr bê exlaqî dikir û tu huzûrekê nedida mêrik. Mêrik lêxist nebû, birçî hîşt nebû, ji mal qewirand nebû!..

Got qenc ew e ku ez biçim ser ziyaretekê (Ziyaret mezelê nexwe şehîdan an mirovên bi başî hatine nasîn) û ji wî rica bikim, belku ew jî dua bike û Xwedê ruhê jina min ya mezin bistîne û ez ji wê xilas bim.

Rojekî çû ser ziyaretekê û pîrr giriya. "Got ey ziyareto, dibên tu mirovekî mezin î, ji Xwedê rica bike bila Xwedê ruhê jina min ya mezin bistîne, ezê ji te re qurbanekî serjêkim û xêra te li feqîra belav kim."

Piştî dua hat gund, dît ku gundî li ber derê mala wî civiyane. Kêfa wî hat got "Xwedê duayê min û şehîd qebûl kir."

Ji gundiya pîrsî "gelo we xêr e hun hatine ber derê me"?

Gundiya gotin; "jina te ya biçûk miriye".

Mêrik hêdîka dîsa berê xwe da şehîd, çû ser mezelê wî û jê ra got:

Şehîdo, şehîdo ma deng ji alî qûnê va tê te? Min çî got û te çî kir?"

Dîn li çi dinhêrin?

Di nexweşxanekê de nexweşên ji aqil (dîn) heroj diketin rêzê, xwe didan ber dîwarekî. Di dîwar de qulek biçûk hebû, dînan li wir dinhêrin. Doxtor mereq kir "gelo vana li çi dinhêrin!"

Doxtor jî rojek ket nava wan û li qula diwar nihêrî, bala xwe dayê ku qula bizmarekî ye, pirr biçûk e û tu tiştekek naxuyê. Dûvre deng li dînan kir û got:

- Heyra min jî nihêrî û tu tiştekek tune, ev çî ye hun heroj lê dinhêrin, ka hun çi dibînin?

Yekî ji dînan got:

- Tew mal xirab doxtor, em bi salan lê dinhêrin me hêj tiştekek nedî, ka tu yê rojekê çi bibîni?

Diya Mixtar û Melayê gund"

Bi angorê dînê îslamê ji gunehên mezin yek jî îftira ye. Berê bi taybetî di gunda da zêdetir îftirayê dizî, qabî û wek wan dihat kirin, lê li bajara dewlemenda û siyasetmedaran pirr lihev îftira dikirin.

Dema feodalî li welat pirr xwirt bû wê demê kesên pirr mehkûmê îftirayê dibûn Melayê gunda bûn. Şeyx wan dişand gundeki dikir mela, dema wek şeyx neaxivîna şeyx bi yek gotinek wan ji gund davêt û kesî nikaribû xwe biparazta jî. Îja vê dawîyê mirîdê şeyxan gellek bûbûn û dema li mela îftira dikirin mela jî xwe di paraztin.

Sal 1984 bû, meha Sibatê surr, serma û seqema Serhedê. Mela Evdirrehmanê reben cara 54'a bû ku sirgûn dibû. Vêcarê ji Patnosê şandibûn Milazgirê. temenê wî jî derdorê 50/60 hebû. Bixwe mirovek gelek zana û ronekbîr bû. Welatparêzekî gellek qenc bû, lê mixabin wan sala welatparêzî li gellek ciyan belayên mezin danên pêşiya mirov.

Rojek şeyxê mezin yê cinar tê serxweşiya camêrek. Behsa îsqata mirî tê holê. Şeyx dibê
-Ka pera û genim bînin em îsqata wî bigerînin.

Mela dibêje

-Baş e, lê ka feqîr tunene, îsqat mafê feqîra ye. Şeyx dewlemend e îsqat lê naçe, ez jî Memûr im, miaşê min têra min dike. Gazî deh feqîra bikin em îsqatê li wan parvekin.

Hinek dibên lê heta niha şeyx tim îsqat digerland û nivî jî dixwar, va çiyê?

Mela dibê bawer bin ew îsqata qebûl nebûye û şeyx jî heram xwariye!..

Şeyx dixeyide û diçe, Mehek şûnve muftî gazî mela dike.

Mela gundiye te dibên tu her meh du cara diçî Erzirumê û diçê kerxanê. Ez zanim derew e, lê mixabin du heb jî şahid hene, em mecbûr in te bidin mehkemê. Duh mixtar bi tev du gundiya li vir bûn. Mela dibê baş e, ji kerema xwe re roja mehkema min gazî hersiyar jî bikin, ka bila li ruyê min bêjin.

Roja mehkemê mixtar dibêje, melayê me mirovek nebaş e, miaşê dewlet didê hemî li rêya kerxana serfdike û li pêşiya me jî nimêj dike, em dixwazin hun vî melayî ji vir sirgûn bikin. Aha vay du heb şahid jî hene, wan bi çavên xwe mela li wir dîtine.

Muftî ji şahidan dipirse.

Şahid dibên belê me bi çavên xwe li wir dît. Muftî dikene, dibê lê karê we li wir çi bû?

Şahid hinek soro moro dibin, dibên em cahil bûn, lê mela!..

Muftî dibê mela ka xwe biparêze.

Mela dibê mufti efendî ka ji kerema xwe pirske, madem ku ewana wir nasdikin bila bêjin, gelo mehê du cara mirov ji Patnosê biçê Erzirumê, şevêk ji li wir bimîne, bi çiqasî li mirov dibe mal?.

Dema muftî, mixtar û herdu şahid hesab dikin ku miaşê mela têre du car çûyîna Erzirumê û karên li wir nake. Mela dipirse gelo 28 rojên din ez çawa û bi çi îdare dikim, ka bila bersiva vê jî bidin.

Mixtar û şahid li çav hev dinhêrin, mela dikene, dibe: "Muftî efendî, bawerbî diya mixtar bî ye û di gunda navê wê pîr derketiye, hemî cîran dibên ku diya

mixtar carekê bi heft panût û niv (7,5) dide. Way şahid û mixtar dibên li Erzurumê 40 panot e. Ger dilê min tiştêk wisan bixwaze ezê çima biçim Erzurumê, vay diya mixtar bi nan û ava xwe hazir e. Heta du cara biçim Erzurume ezê 40 carî biçim cem diya mixtar. De ka telaqê mixtar û van herdu şahidan bidin dest wan bila sondbixun, mesela diya mixtar rast e an ne.

Mixtar sondixwe dibê ez hay jê nînim, min nû sehkir, lê şahid bê deng dimînin. Miftî xwe hêrs dike û dibê bicehimin biçin, carek din we li vir nebînim.

Mela dibê mixtar tu hatî heyfa şeyx lê te q. diya xwe jî da ser!..

Bi tev derewa mixtar û şeyx disa jî mela sirgûn dikin. Bawerim niha miriye Xwedê rehma xwe lêke.

Dizê porteqalan

Bi şev, di diziya porteqalan de, du kesan telîsekî mezin dagirtibûn.

Piştî kû çewalê xwe dagirtin, bi kelecana direviyan û lingê wan, li pişt quna wan diket ji tirsana dergevanê bexçe. Naxwe dê bihatina girtin.

Dema gihan cihekî ewle, pêwîst bû ku, porteqalan li hev parvebikin.

Çavên xwe gerand in, ji xeynî nav ziyaretê cihekî bi qîm tinebû ku bi serîkî rehet xwe ji hev safî bikin. Gava derbasî hûndirê ziyaretê bûn, ji telîsê wan du porteqal ketin erdê ! Lê; haya wan, ji porteqalan hebû kû ket in.

Herdu dizan, di nava qebranda cihê xwe girtin û porteqal, ji telîs valakirin. Divabû porteqalên xwe, bikin du par (an jî, pişk) !

Du bahrên wekî hev divabûne bêne çêkirin, ji bona kû neheqî li kesekî nehatina kirin.

Jiber kû şev bû, di tariye de, encex bi îşareta destan û lib û lib bêne nivîkirin.

Herdû dizan; dest bi nivîkirinê kirin...

- yek ji min re, yek ji te...

û wisa berdewam kirin !

Di wê kêliya jimartina wan de; du kes, di ber ziyaretê re derbas dibin !

Dema hisdikin kû, dengê xerîb ji nav mezel tê, di navderê de disekin in û guhê xwe bi ser axaftinê ve pêldikin. Qenc guhên xwe didine wî dengê xerîb . Dev û lêvên wan, li hev dikevin ji tirsan.

Weha ji hev re dibêjin ;

- Wele ev melekên ezabê (melaîketê devê cinet û cihnemê) ne û hatine miriyan ji hev diveqetênin, ji loma dibên "yek ji min re yek ji te re ! "

Di wê navê de, parvekirina porteşalan jî xelas dibe û dibêjin;

- Du hebên li ber derî jî, yek ji min re ye û yek ji te re ye !

Çawa vê gotinê dikin, herdû camêrên guhdêr, li ber derî dibên "terp" û bêhiş dikevin !

Halhale mebest, herdû porteşalên ketî bûn... 😊🤔

[Memê Miksî](#)

Dor nahat min

Jinikê mêrê xwe dabû dadgehê (mehkemê).
Mehkeme saz bû, hakim ji jinikê pirsî dawa te ciye?
Jinikê got: Mêrê min bi min ra naaxive. Va bû salek
ez diaxivim ew dengê xwe nake, ez çî dibêm li min
dinhêre, dengê xwe nake. Hakim beg min ji vî bide
berdan em jihev xelas bin.

Hakim pirskir "gelo şahidên we hene?"
Şahid tunebûn, tenê mêr û jin.

Hakim ji mêrik pirsî "lo Evdô jina te dibê, ku tu pê ra
naaxivî rast e?"

Evdî sekinî got "hakim beg welleh xwe ji Xwedê dike,
derew e, ez pêra diaxivim.

Hakim got "kuro Evdo jina tê dibê va salekî ye, te yek
gotinek negotiye çima?"

Evdî got "hakim beg welleh ez li benda dora xwe me,
va salek e jina min diaxive hêj dor nahatiye min :)"

Duayê kurd û tirkekî

Çîrokek heye, tim cara di civaka kurd de tê gotin.
Pirrê caran li ser çavnebarîyê tê bikar anîn.

Dibên ku kurd ji xwe û cîranên xwe re tim dilxwaz in
lê tirk ne wisa ne. Vaya jî bi pêkenîkî tînin ziman.
Pêkenî ye an jî gotinek ecêb e bila ev jî xwendevan
bêjin!..

Dibên ku kurd û tirkek ku her du jî pirr feqîr in, diçin
hizûra Xwedê. Dibên

-Ya Rebbî em feqîr in û ji te hinek tiştan dixwazin.

Xwedê dibê "em daxwaza bendeyên xwe qebûldikin lê
çi kesên ji xwe re çi bixwaze em du (2) qasî wi didin
cîranê wî jî. Hun kî çi ji xwe re bixwazin emê du qata
bidin hevalê wî, de ka kurdo tu pêşî bixwaze."

Kurd dibê:

-Ya Rebbî ez dixwazim tu 100 pezî 20 dewarî bidî
min.

Xwedê dibê baş e min 100 pez û 20 dewar dan te û
200 pez û 40 dewarî jî da cîranê te yê tirk.

Kurd spasiya Xwedê dike û disekine. Xwedê ji yê tirk
dipirse ka tu çi dixwazî, dibê

-Ey Allah'im ez tu tiştêk naxwazim sirf çavek min kor
ke:))

(yani çavek min du qat ji cîran ra ku dibe 2 çavên
kurd)

Duayê Seyda paşpê qebûl dibû

Dema ez li Mersînê bûm ji koçberên Kurdistanê Mela Beşîr carnan dihat buroya min, me hinek derd û xeman jihev re digot.

Seyda ji hêla Botan bû, ji welat hatibû derkirin, dewleta tirk gundê wan şewitandibû, seyda ji mecbûrê koçber bûbû hatibî Mersînê. Mal, milk hemî ji dest çûbû, jixwe re erebek destan bidest xistîbû zerzewat difrot. Gelek jî henekvan bû. Dema diket hundur digot bi ereba min heneka nekî ha, va ereba îdara malbatek kurd dike, hindik tişt nîne ha;))

Rojekê got ezê bûyerek ku hatiye sere min ji te re bêjim. Min got Seyda fermo ez guhdar im. Seyda bûyer wiha got ji min re, ez jî wek wî gotiye ji xwendevanên hêja re dinvîsînim.
„Rojekê ez ji gundê me diçûm gundê kêlake me. Di nava me de qiyamekî heye, dema min berê xwe da qiyame, min dît ku çokên min nagrin ku ez birêve biçim. Ez rûniştim min destê xwe bilindkir. Min got: „Ya Rebbî Tu 2 xortên kurd rastî min bînî ku bi destên min bigrin, min ji vî berjorê derxin.“

Hêj 5 deqe derbas nebûbû min dît dengê hat.

- Hey kurdo kipirdama yoksa vururuz vallah (Hey kurdo xwe tevnede an emê te bikojin welleh)

Min serê xwe guherî ku du heb cendirmê tirka tiving li min rast kirine.

Min got we xêr e?

Gotin em diçin gundê ha, ka me bide pişta xwe ji vî qiyameyê derbaskel!.

Ez fikirîm, bixwe bixwe min got ya Rebbî min çi xwest û Te çi şand pêşiya min?

Min ji cendirman re got "law welle ez kal im, temenê min 70 salî ye, min lehzek berê ji Xwedê xwest ku du heb xort rastî min werin min derxin jor, lê way duayê min îro paşpê qebûl dibe."

Wan got "em nizanin an me didî pişta xwe derxixî jor an emê gulek berdin te, te bikujin."

Min carê yek da pişta xwe derxist jor, lê ez jî perîşan bûm, belku saetek li erdê mam, wana çend pîna li min xistin û çûn.

Dema ez bixwe ve hatim, hêdî hêdi çûm gundê cîran, xinamiya me ez dîm hate mile min maçkir (li Kurdistanê jin diçûn mile rûsîpiya di şûna dest da, boy ku mezhebê kurda bi pirrayî mezhebê Şafiî ye, boy destnimêj neşkê). Xinamiyê got:

"Seyda torinê te hinek nexweş e, ka jê re duakî bike."

Min destê xwe bilindkir û min got: "Ya Rebbî tu vi zarokî tim nexweş bixî, tendurustî qet tunebe, temenê wî kurt be, serî ji bela xilas nebe, çiças afat û bela hene li cîhanê tu hemiyan bi ser wî de binî, û tu demî dilê rehet nebîne!."

Xinamiya min şaş ma û pişta xwe da min çû. Negot ka were mal.

Ez çûm maleka din.

Lê heftêkî şûnva dîsa çûm wî gundî, xinamiya min di eywanê de ez dîm, hima çav lêbû biçûya hundir, min deng lêkir.

- Xinamiyê ka neçe, were ka bêjê torinê me çawa bû?

Xinamiya min ji mecbûrê hat, li min pirsî û got

„Seyda welle te nifir kirin lê Xwedê paşpê qebûl kir, torin pirr başe maşallah“.

Ez keniyam min got na welle, Xwedê duayê min qebûl kir.

- Lo Seyda te dua nekir te nifir kir

- Bele xinamiyê, lê wê rojê Xwedê ji min hêrsketibû, min çî bigota Wî paşpê qebuldikir, loma min nifir kir ku bibe dua.

Min ji xinamiya xwe re mesela xwe û cendirman jî got. Xinamiya min gelek keniya got Seyda welle rast e, de keremke em biçin mal.

Durustî baştir e!

Micheal ile David du heb pîlotên Emerika balkafira wan li hewa xirav dibe, xwe davêjin çolek ji çolên Erebestanê.

2-3 rojan tî û birçî li cîhkî digerin, dawîn da rastî mizgeftê tîn.

Davîd: Em biçin vê mizgeftê, ezê bêjim navê min Ehmed e, ez musliman im. Tu bibînî çiqas ji me hezkin, xwarinê bidin me, em çî bixwazin wê bidin me, tu jî bêje ez jî musliman im.

Michael: Na ez nasnama xwe naguhêrim, çî bim ew im, em mêvanê wan in êdî ew dizanin.

Bi zor xwe davêjin nêzîkî mizgeftê. Îmam tê pêşwaziya wan, ji xwe sehkirine ku balafirekî Emerika ketiye.

Meh meha Remezanê bûye lû herdu pîlot nizanin.

Davîd: Ez Ehmed musliman im elhamdulillah, va jî hevalê min Michael.

- Ez Michael, ji Emerika me û xiristiyan im

Îmam emrê karkera dike dibêje:

Van herdukana misafirê me ne, Michael ne musliman e, çî dixwaze bidinê, nan, av, xwarin, mêva.

Dizvire ser Davîd: Ehmed bira, rojiya te pîroz be, êvarê di fitarê da em bi hevra ne!

Em qezayê biçûk dizanin!

Mêrik ji Amedê diçû Wanê, dema ku li balafirê sarbe dengê hat guhê wî

- Eman ha sarê balafirê nebe, va balafira li herêma Bilîsê dikeve û kes jê bi saxî xilas nabe.

Mêrik zivirî li derdorê xwe mêzekir kes nedît. Lê tirsîya û zivirî mal. Li mal li ber radyoyê xebera guhdarî dike. Û xebera nexweş "Balafira ji Amedê diçû Wanê li Herêma Bilîsê ket û kes jê bi saxî xilas nebû!"

Mêrik şaş ma, gelo ew kî bû xeber da min û min ji mirinê xelaskir!..

Lê karê wi heye mecbûr e, biçine Wanê. Baş e ya herî qenc bi tirênê biçê. Çû bilêta xwe birî lê dema sarê tirênê be dîsa ew denga, "eman sarê trenê nebe di rêda terorîst hene wê bombe bavêjin trenê, tren wê bikeve nava gelî kes xilas nebe."

Camêr dîsa hat mal, dîsa radio û dîsa xebera nexweş!

Mêjoyê mêrik baş tevihev bûye, lê karê Wanê?..

- Baş ew e ku ez bi otobosê biçim. Dema sarê otobosê dibe dîsa ew deng.

- Eman ha sar nebe va otobosa birê de qeza dike û kes xilas nabe!.. Mêrik zivirî kes tune, heta jê hat qêriya;

- Tu kî yî looooooooooo, tu çima xeberên wiha didî min, jiyana min xilas dikî?

Tu çima xwe nîşan min nadî ? Ka derkeve ez te bibînim?

Dît xişînek berpê tê, devek nêzîkî guhê wî bû û wiha got;

- **Ez melekê te yê xêrê me, dema tehluka jiyana te çêbe, wezîfa min ew e ku te agahdar bikim.**

Mêrik gelek aciz bûbû û dîsa pirsî

- Belê dema ez bi vê **jinê re** zewicîm hun li ku bûn Xwedê bela xwe bide weeee!

We wê demê çima min agahdar nekir?..

Melek dîsa xwe da ber guhê wî û wiha got:

- Qisûrê nenhêre em ancex ji qezayên biçûk dikarin agahdarî bikin!..

(Yanî zewac û va jina te qezayê mezin in)

Eman ha behsa wî kûçikî nekin!..

Dibêjin ku li orta Anatoliyê mirovek hebûye û bi navê xwe Mehmet bûye. Dema ew dimire kurekî wî yê biçûk hebûye. Lawik mezin dibe, li derdorê xwe dinhêre, bavê herkesî heye lê yê wî tuneye. Mereq dike, rojekî ji dayîka xwe dipirse:

- Dayê ma bavê herkesî heye, lê bavê min li ku ye?

Jinik li kurê xwe mêze dike, diqîre ser wî:

- Eman ha tu carek din behsa wî kûçikî nekî!.. Tu carek din behsa wî kûçikî bikî, ezê herdu çavên te birêjim û zimanê te jêkim!..

Kurik ditirse, êdî newêre behsa bavê xwe bike, ne ji diya xwe û ne jî ji cîranan.

Piştî çend salan lawik mezin dibe û hinek cesaret tê wî. Rojekî dîsa ji dayika xwe dipirse, lê mixabin bersiv dîsa wek cara berê ye:

-Eman ha behsa wî kûçikî neke!...

Lawik difikire, gelo dibe ku navbera diya min û bavê min xirav bûbe û ewî li diya min heqaret kiribe, ji wî diya min naxwaze behsa wî bike!.. Herî qenc ew e ku ez ji hinekên din bipirsim. Diçe bal xalê xwe.

"Xalo bavê min yekê çawa bû?"

Xal jî wek diya wî diqîre ser:

-Eman ha behsa wî kûçikî neke!...

Diçe bal metê, dipirse:

- Eman ha behsa wî kûçikî neke!...

Diçe bal cîranan ji wan jî dipirse:

-Eman ha behsa wî kûçikî neke!...

Rojek ji roian cejna Qurbanê ye. Hemî gundî çûne ser mezela û ji miriyê xwe re Qur'anê dixwînin an jî didin

xwendin. Lawik diçe bal melayê gund, jê re dibêje:
- Îmam efendî, tu dikarî yasînekê li ser gorra bavê min jî bixwînî?

Mela serê xwe bilind dike, lê dinhêre lê nasnake.
Dibêje „belê ezê bixwînîm“.
Dema xwendina mela xilasdibe, ji lawik dipirse:
- Gelo mezêlavê bavê te kîjan bû?

Lawik dema mezêlavê bavê xwe nîşan mela dide, mela bi cinna dikeve:

- Neuzu billah! Lawo tu kurrê wî kûçikî yî? Eman ya Rabbî dîn ji destê me çû. Kurro lawo ji min re behsa wî kûçikî neke!...

Êdî lawik newêre behsa bavê xwe bike heta ku dema leşkeriya wî tê. Ji diya xwe re dibêje,
- Dayê ez diçim leşkeriyê û êdî hew ez têm. Heke tu behsa bavê min bikî ezê şûn ve werim, ger tu behs nekî ez êdî nayêm. Tu vî baş bizanibî!...

Jinik dêna xwe didê lawik rast dibêje, diçe û nayê.
Mecbûr dibe û jê re dibêje.

- Kurrê min bavê te mirovekî pirr qenc bû, hemî kesan jê hez dikirin, navê wî Mehmet bû lê ji ber exlaqên wî yê xweş gundiya jê re Mehmet Efendî digotin. Bi xwe karker bû, îdara mala me dikir. Demekî nexweş bi ser me da hat û em feqîr ketin. Bavê te nikaribû karek ji xwe re bidiya. Duv re em pê hesiyar ku diçe nava mezelan, miriyan dişêlîne, çekên wan dibe divroşe. Gundî pê hesiyar û lê lanetê anîn,. Ji wê rojê şûn ve êdî kesî navê wî nanî ser zimanê xwe.

Lawik difikire „Xwedê xirav bike va dunya rezîl, mirov ji bo îdara mala xwe dikeve çî halî!“ Duv re li çavê diya xwe dinhêre, dibêje:

- Dayikê, bavê min ji bo rizqê min û te xwe perîşan kiriye, kî jê xû dike bila bike, lê gere ez û tu em jê hezbikin, lewra çî kiribe ji bo me kiriye. Ez poşman bûm, heta ku ez rehmetê li bavê xwe nedim xwendin, ez naçim leşkeriyê.

Jinik şaş dimîne, gelo wê çawa rehmet li bavê xwe bide xwendin!

Çend roj şûnva, mirovekî maldar ji gund dimire, lawik bişev diçe mezêlê wi vedike, cenazê wî derdixe derva, bi angore adeta wî welatî, hemî zêrr û zîvên wî, pereyên wî, pot û çekên wî digire. Mirî datîne ser mezêl qulopanî dike û darekî jî di mirîda dikute û wisan dihêle. Bi dizî tê mala xwe.

Dema dibe sibe, gundê bi meselê dihesin, hemî dicivin û dikin qêrîn, zarîn. Gelo ev dizê nû kiye. Ji her yekî dengekî tê:

- Xwedê rehma xwe li Mehmet Efendi bike, ew pîrr baş bû, mirî dişêland lê dîsa fikir mezêl!

- Xwedê rehma xwe li Mehmet Efendi bike, ew pîrr baş bû, me qedrê wî nizanîbû!

-Xwedê rehma xwe li Mehmet Efendi bike, ew pîrr baş bû, mirî dişêland lê singekî tê da nedikuta!

- Xwedê rehma xwe li Mehmet Efendi bike, ew pîrr baş bû!

- Xwedê rehma xwe li Mehmet Efendi bike!

- Xwedê rehma xwe lê bike!

-Xwedê rehma xwe!.....

Jina Mehmet Efendî ku bi vana dihesê şaş dimîne, ji kurrê xwe dipirse:

- Lawo ev çî mesele ye ku gundî rehmê ji bavê te re dixwazin?

- Dayika min mirov hetta pîrr xiraba nebîne qedrê yê din nizane!...

Embara Xwedê

Dibêjin, melayek li gundekî hebûye, pirî zikê wî mezin bû, dema Melê li pêşiya gundiyan nivêj dikir nikaribû xwe ji bo "rikû`" û "secde"yê xwar bike.

Gundiyan got Melê:

- Seyda divê tu hindik xwarin bixwî bila zikê te dakeve, da tu karibî li pêşiya me bi hêsanî nivêj bikî.

Melê gotiye gundiyan xwe:

- Zikê min embara Xwedê ye, tiştêk pê nabe.

Di wê navê re demek bihuriye, êvarekê piştî şivê zikê Melê dirriyaye û xwarina ku xwariye tev derketiye derva.

Jina Melê kiriye hewar û gazî, gotiye:

- Hahoooo... Gundîno.... Hewar eeee... Zû werin.

Jinê gundî pê ve çûne û li ber deriyê malê pirsîne, gotine:

- Jinseyda, gelo çî bûye, çî ciriyaye?

Jinikê gotiye:

- Embara Xwedê dirriyaye...

Eslê mirov çibe mirov dizvire bal wê va!

Suleyman Peyxember zimanê heywana jî dizanibû. Rojekê dît ku mişkek serê xwe ji qula xwe derdixe, dibîne ku pisîkek way li wir e, dîsa şûnva dizvire qula xwe.

Suleyman Peyxember ji mişk dipirse "çi bû bi te?" Mişk dibê ya Resûlê Xwedê ez ji pisîkê ditirsim, wê min bigre bixwe.

Suleyman Peyxember dibê ku ez dua bikim Xwedê te bike kûçîk tu yê dîsa bitirsî?

Mişk dibê na lo, wê dem pisik ji min ditirse.

Suleyman Peyxember dua dike, mişk dibe kûçîk, lê dema pisîkê dibîne dîsa ditirse!

Suleyman Peyxember dibê îja çibû bi te?

Mişk (kûçîk) dibê ya Resûlê Xwedê tu nabînî pîsîk jî bi qasî min e!

Suleyman Peyxember dibê de baş e ezê te bikim şêr, tu yê êdî netirsî ne wisa?

Mişk (kûçîk) dibê na ya Resûlê Xwedê.

Suleyman Peyxember dua dike, mişk dibe wekî şêrekî.

Dema mişk (şêr) berdidin derva û çav bi pisîkê dikeve, dîsa ditirse û xwe vedişêre.

Suleyman Peyxember dibê "mirov bi gor sifet, şikil û meqam çiqas were guhertin jî, eslê mirov çibe ew e, her tişt dizvire bal eslê xwe va!

Evdo çima ewqas digrî?

Rojekê li gundê Xeleka yekê gelek dewlemend miribû. Camêr her çiqas dewlemend bû jî, lê kesek ji eqrebayên wî tunebû. Der û cîran gelek berketin lê dîsa jî wek eqreba kesek liser wî nedigiriya. Lê Evdo xaric. Evdo pirr digiriya!

Yekî jê pirsî:

- Lo birê Evdo tu çima ewqas digrî?

Evdo got:

- Boy cîranê ewqas dewlemend?

- Êêê bavê ji te re çî? Mirovê te nîne, bav û birayê te nîne, tu çima ewqas digrî?

Evdo got:

"Jixwe bo wî digrîm, ku ewqas dewlemend bû, kesek wî tune, ez jî ne eqrebayê wî me û ew mal milka namîne ji min re." :)

Eydo ji herdu eydiyan jî ma!

Menfeet û çavbirçîbûn car heye mirovan rezîl dike!

Li bal me gundekî heye, navê wî Ş..ye. Min nedît, lê ji wî gundî hinek hevalên min yên feqîtiyê hebûn wan digotin:

Li gundê me mirovekî heye û navê wîye. Ji ber ku ev mesela hatiye serê wî gundiya navê wî danîne Eydo!

Eydo ji şekir pir hezdike. Ji ber vî jî, çiqas eydî çêdibin, Eydo li malên hemî gundiya digere û xelk yek şekirêkî digire, ew kulma xwe tije dike û dike cêva xwe. Ev tiştêkî kifşe ye û her kes pê dizane. Di eydîkî da camêr difikire dibêje:

"K.... gundekî di ber me da ye, vê eydiyê ezê pêşî biçim wir, ji wir şekirên eydiyê top kim û dûv ra werim gundê xwe, li wir jî top kim. Êêê.. şekirê du gunda wê demek dirêj têra min bike."

Sibê diçe mizgeftê ji bona nimêja eydiyê, lê Xwedê ji mela razî be, wê rojê wa'zê dunê hatine bîra wî û dev ji cemaetê bernade, dirêj dike û dirêj dike!.... Piştî nimêje gundî li ber derê mizgeftê eydiya hev pîroz dikin.

Hinek jî zeman li wir derbas dibe. Nihayet Eydo ji gundiya xwe xilas dike û berê xwe dide K....ê.. Dema tê navbera her du gunda, li wir çemekî heye jê re dibêjin çemê newala M...ê. Eydo li ber çem disekine û li rojê dinhêre ku roj hatiye dema nîvro.

Dibêje "ez heta biçim K...ê dibe derengî û êdî şerme ku ez li mala bigerim. Qenc ew e ku hêj dem zû ye, ez bizvirim gundê xwe û li wir şekira bicivînim.

Eydo berê xwe dide gundê xwe û tê, lê mixabin heta ku tê gund, gundî li eydiyê geriyane û her kes çûye mala xwe. Êdî rûyê camêr nagire ku li eydiyê bigere. Bi vî awahî ji kerba nexweş dikeve. Gundî bi mesela camêr dihesin û navê wî datînin Eydo û dibêjin:
"Eydo bi şekirê gundekî razî nedibû, xwest ku di rojekî da du eydiya bike, lê mixabin ji her du eydiyan jî ma.

"Eydo ji her du eydiya ma" bu gotinekî û ket devê xelkê.

Ey Xwedê min got kîjan deriyê veke û te çi deri vekir?

Mirovek me yê serhedî genim dajo.

Dema genim digihjê, rojekê diçe nava zeviya xwe, dibêje ka ez li simla binhêrim îsal rewşa genim çi ye. Pisporek ziraetê (çandinî) li welat gelek zanayî bûn. Dijmartin di qeremetrekî da çend simil hene, di her simlekî da çend genim heye û di qeremetrekîda çiqas (katolik, teneke, kilo) genim heye. Bi vî awahî hesabê zeviya xwe dikirin ka di zeviyê da wê ew sal çiqas genim hilde.

Camêrê me yê serhedi jî diçe nava zeviya xwe û li alîkî dest davêje simlekî lê dinhêre şûna heba pîrr in lê hemî vala ne. Yeka din dinhêre ew jî vala ye, yeka din jî, yeka din jî... Bi vî awahî gelek simil qontrol kir û hemî vala derketin. Moralê wî şikest, got eywax îsal genim tune mala min xirav bû, ka ezê çi bikim.

Destê xwe bilindkir û dua kir:

„Ey Xweda yê min, te îsal genim neda min, simil vala ne, ka ezê çi bikim! Ey Rebbê min ka ji min ra derîkî xêrê veke!“

Hima di wê demê da jina wî jî tê cem wî. Bakî gurr tê, ba lê dixê pêşa jinikê bilind dibê, binê pêşê dixûyê.

Mêrîk carek din destê xwe bilind dike û dibêje:

„Rebbê min min got derîkî xêrê veke, hima ne ev deriya bû, ez heroj vî deriyê han dibînim min tu xêr jê nedît, Tu derîkî din vekî ji min ra!“

Ez bi Xwedê re diaxivim!

Ez di sala 1997 an da hatim Almanyayê. Sê (3) meha mam li kampa Dürenê, piştî wî min şandin gundekî Paderbornê "Salzkotten"ê. Ciyê me gelek nebaş bû. Tu xeberek ji mehkema min nedihat. Wisan kifşe bû ku mehkema Alman dilê wî tunebû ku pasportê bide min, ji ber ku ji wêne yên min yên rojanaman û ji fezleka dosya min tirsiyabûn. Lewra 12 sal û 6 meh jî cezayê min hebû.

Salzkotten her çiqas gund bû jî, lê bi qasî bajarekî mezin hebû. Di vî bajarî da ji min bêtir kesî nimêj nedikir. Odekî biçûk dabûn me çar heba. Ciyê runiştandinê jî bi dest nediket. Masekî me ya dirêj hebû û min seccada xwe li ser masê radixist û nimêj dikir. Hevalekî min hebû ji tirkê Rihayê navê wî Musa bû. Her çiqas tirk bû jî, di mehkemê da gotibû "ez kurd im û dewleta tirk li min zorê dike". Ji xwe ev qedera me ye, "tirk me millet nahesibînin lê dema kara wan hebe xwe dikin kurd!"

Rojekî wî xwe di nava ciyê xwe da dirêj kiribû û min got qey razaye. Êvar bû wextê nimêja îşayê. Min seccada xwe li ser masê raxist û piştî nimêjê min bi dilekî şewitî dua kir. Lê bê îxtiyariya min dengê min çûye hevalê min û min dî serê xwe bilindkir û pirsî:
-Mamosta tu bi kî ra diaxivî?

Min got:

- Ez bi Xwedê ra diaxivim.

Musa li çavên min mêzekir û bawer kir ku ez bi Xwedê ra diaxivim, şaş ma û pirsî:

-Tu çi dibêjî ji Xwedê ra?

Min got ez dibêm:

"Ey Xweda yê min! Di vî bajarê hanê da ji min bêtir kes ji te re secde nabe û serê xwe ji te re natewîne,

tu rojekî pêş da passa min bişînî û min ji vî bajarê qirêj xilas kî!

Musa demekî dirêj sekinî, fikirî serê xwe hejand û bi xwe bi xwe digot Allah Allah! Dûv re berê xwe da min û axivî:

-Wellahî te tişteki wisa rast got ku:

- Xwedê tu rê ki nebîne û te xilas neke!"

Hinek sekinî dîsa pirsî:

"Gelo dengê Xwedê nahat min Wî ji te ra çî got?

Ez keniyam û min got:

"Musa wellahî deng nay min jî, lê ez bawerim wê tişteki bêje.

Çend roj şûn va pasa min hat, min mizgîn da Musa û jê pirsî:

-Musa Xwedê passa min şand, lê ez nizanîm duayê min bû an jî yê te?

Musa hinek sekinî û got:

-Ez nizanîm duayê ki ye, lê ya ku min fêhm kir, mirov bi rastî gazî Xwedê bike Xwedê mirov xilas dike!

Ez qarişi işê Xwedê nabim

Dibên mirovek hebûye, heroj digot ez nizamim Xwedê van kêzikên rêxê (kêzikên reş yên rêxa heywana topdikin û dibin qula xwe ji boy zivistanê) boy çî afirandiye? Him dibêje him jî xwe aciz dike. Dibê: "Ka fêda van kêzikan çî heye!"

Rojek nexweş dikeve, dibin doktor, doktor dibêje: "Dermanê te gerek tu kêzikên rêxê di nava rûn de biqelînî û heftêkî bixwî, an çara te tune."

Mêrik dibê "ez bimrim jî ez kêzika naxum."

Lê roj biroj saet bi saet diçe mêrik xirav dibe. Diçe bal çend doktorên din jî, hemî eynî dermanî tewsiye dikin. Feqîro bêçare dimîne û dişîne hinek kêzika dicivînin, wek doktora gotine di nava rûn de diqelînin û mêrik 2 hefta dixwe û baş dibe.

Demek şûnve, rojekî di geştiyekê de diçin, di nava deryayê de firtone radibe, qêrin bi xelkê dikeve, yên digirîn, yên gazî Xwedê dikin, yên gazî şêyxê xwe dikin! Lê camêr qet mû dixwe tevnade. Yek tanek lêdide û dibê "heyra tu çima qet deng nakî, tu nabînî wa geştî werdigere, em hemî dixeniqin?"

Camêr dibê "ez çî bikim? Min di jiyana xwe de carek bi karê Xwedê eleqe kir, wê carê jî bi min kêzikên rêxê da xwarin, êdî min tobe kiriye ez hew têkilî bi karê Xwedê dikim (qarişî işê Xwedê nabim). Ew çawa dike ew dizane, ez pê eleqeder nakim!"

Goştê Rûvî tê xwarin?

Sal 1983 bû. Em 270 Îmam û xebatkarên Diyanetê li Xarpêtê li semîrekê bûn. Roja yekem midurê Qursê di civînê da got: "Em ji muftiya daxwaz dikin ku hevalên kêmasiyên wan hebin bişînin cem me ku em hinekî wan fêr bikin, lê em dibînin ku muftî ji kê aciz bin wan dişînin, le dîsa jî em we 45 rojan ji dirdira jinan û zirzira muftiyan xelas dikin.

Wan deman ez hêj pirr ciwan bûm û gelek jî enerjîk bûm. Me ji cemaetên Tirka yê îslamî omdî dikir ku wê qanûna Îlahî binî Tirkîyê, loma jî min gelek girîngî dabû ser xebatê. Min li ku kê bidîya jê ra doza xwe digot. Her wiha di qursê da jî wisan bû. Loma jî gelek îmamên heval dor li min digirtin û tişt dipirsîn. Rojekê dîsa wiha çend heval hebûn em diaxivîn.

Îmamek ji meletû hat pirsî got hun çî diaxivin?

Yekî got em hin tiştê ji mela Nuredîn dipirsin ew jî bersiv dide.

Got aha pirsek min jî heye. Mela hun Şafiî goştê rûvî dixun?

Min got li mezhebê me xwarina goştê rûvî tehrimen mekrûh e!

Got: "Wî kûçik goştê rûvî naxwe, Şafiî çawa dixun?"

Min got: Kûçik jî wek te henefî ye loma goştê rûvî naxwe.

Got welle ez nizanîm êdî çî bêjim.

Yekî bicehime biçe te em rezîl kirin.

Gundê Sofî Çaço tê da be!

Pismamê min hebû digot:

Rojeki ez li ber derê mala xwe sekinîbûm. Min dît ku du heb merifên ne ji hêla me hatin gund. Dema hatin ber derî silav dan û gotin:

- Tu mêvana xweyî dikî?"

Min got "belê ser sera ser çavan, kerem kin werin hundir."

Dema hatin runiştin, min pirsar wan kir "hun kî ne û li çi digerin"?

Gotin; "em ji xwe re li du heb çêleka digerin ji bo malê".

Min got: "Belê çend heb çêlekê min hene, ez dixwazim wan bifroşim û ji xwe re di şûna wan de pez bikirim, lê binêrin ger hun qebûl kin ezê du heba bidim we." Camêra li çêleka nihêrin û du heb ecibandin. Bihayê wan dane min û xwestin ku birêkevin, min nehîşt, min got "heya hun nîvrojê nexun hun naçin".

Wan qebûl kir û yekî ji wan got "ezê destmêja xwe teze kim û nimêj bikim".

Min misînê avê tijekir da destê wî, pê re derketim ber derî, xirbekî li pişt mala me hebû, min da nişan û ez zivirîm mal cem yê din. Ez hêj rûneniştibûm min dît ket nava derî û qêriya:

- Lo pismam tu bi qedrê Xwedê kî, ka were ber derî evî ku ezana nîvro dixwîne gelo ne Sofî Çaço ye?

Ez derketim ber derî, min guhdarî kir, belê Sofî Çaço ezanê dixwîne. Min got; "belê ew e". Camêr hima gazî hevalê xwe kir:

-Kuro Heso ecele were lawo Çaço di vî gundî da ezan dixwîne! Berê xwe da min got:

"Birayê min ji kerema xwe ra perê min bide ez
poşman bûm."
Min perê wi dayê û misînê xwe danî erdê û birêketin.

Min gazî kir "mêvanên hêja çêleka nekirin, lê nîvrojê
bixwin, nimêja xwe bikin û dûv ra dîsan herin".

Camêr li pey xwe zivirî got:

"Birayê delal ew gundê ku Sofî Çaço tê da ezan
bixwîne em ne ji wî gundî çêleka dikirim, ne li wî
gundî nimêj dikim û ne jî di wî gundî da mîz dikin,
min ef bike kekê min bi xatirê te".

Hun ji înadê min re nimêjê dirêj dikin

Ez demekî li Varto yê mela bûm. Li wir camêrekî hebû ji ber qebîla wî şêyx bûn ji wî ra jî digotin Şêyx. Her çiqas nav şêx bû jî, lê sofîtiya wî pirr tunebû. Êvara eydiya Remezanê ji mal hêrs dikeve û diçe sûkê. Xelk hemî çûne mizgeftê nimêja "selatuttesbîh" dikin. Kurd ji vê nimêjê ra nimêja dirêj jî dibêjin. Şeyx dibêje "qenc ew e ku ez jî biçim mizgeftê belku ez hineka li wir bibînin û hinek bîhna min derkeve". Wiha digot:

Min berê xwe da mizgeftê, ez dema ketim hundir min dît ku cemaet ji rukûê rabûye. Min niyeta xwe anî û ez tabîê cemaetê bûm, îman got Ellahu ekber çû secdê û hew serê xwe bilndkir. Min carek serê xwe bilndkir, min dît ku herkes di secdê da ye, min carek din serê xwe danî, ez hinek sekinîm, min xwend û serê xwe bilndkir, min dît dîsa herkes di secdê da ye, cara sisiya ku min serê xwe bilndkir û min dît ku hemî di secdê da nin min got:

"Va çil (40) sal e ez carek hatim camiyê, ew jî we kiriye înadê min û hun nimêjê dirêj dikin, madem ku înad e, kî heta sibê serê xwe bilind ke, ker dê û jina wan... de serê xwe deynin!....

Cemaet bi tevî mela va hemî bi min kenyan, mela got "Xwedê te bikuje, wekî ku tu nizanî nimêj bikî çî karê te li mizgeftê heye û heta te nimêja me hemiya da betalkirin?

Îmana zeîf û alîkariya Şeyx

Mirîd çû tekya şêyx û got şeyxê min işev min xewnek dibû ez bejim. Dest bi xewna xwe kir û got;
-Min dît qiyamet rabûbû, me birin hesabê, lê îmana min hinek kêr derket. Gotin ka bigere ku te hinekên îman kamil dît û ji wan piçek îman stend û anî emê te bavên cennetê, an dê tuyê biçî cehnimê. Ez gellek geriyam min pirr kes dîn lê mixabin kesî nikarî hinek îman bida min. Dûvra ez hatim ber derê cennetê min dît tu dinava baxçekî da rûniştibûy û te Quran dixwend...

Şeyx got "bese, êdî nebêje, niha em diçin mizgeftê di hizûra mirîdan de bêje."

Mêrik çiqas israr kir jî, şeyx nehîşt xewna xwe tamam ke.

Piştira çûn mizgeftê, şêyx got "mirîdê min deka xewna xwe ji serî de bêje."

Mirîd dest pêkir û hat ta ku şeyx qur'an dixwend. Got, "ez hatim deste te û min got qurban ez perîşan im, deka hineki alîkariya min bike , li dunya din ewqas min xizmeta te kir, hima piçek îman. Lê te sere xwe bilindkir û got law mirîdê min bi vê Qur'ana liser çokê min ez bi îmanê guman nakim:))

Ji herduyan yek pê digire hima kîjan?

Rojek Melayê meşhûr çûya mala qîzek xwe, wê û mêrê xwe dîz, cêr, kûp û kasik çêkirine dane ber tavê, dua dikin dibên.

"Ya Rebbî çendeki baran nebare dakû feraq folên me işk bibin."

Diçe mala qîza din, wan jî genim ajotiye û dua dikin dibên.

"Ya Rebbê vî çend rôjî tim baran bibariya belkû genimê me zîl bida û hêşîn biba."

Mela dizvire malê û jina wî pirsra halê herdu qîz û zavan dike. Mela dibê "jinik ji herdu zavayên min yek bi k.. min digre, hima nizam kîjan!."

Jinik dipirse çima gelo?

Dibê, ku baran bibare xwediyê cêr û dîz û kupika, ku nebare ewê genim ajotiye:))

Ji niha ve kemalîst im!

Berê demekê hevalemî (Mela Husameddîn) min hatibû em bi hev re li dewletek cîran çûbûn aşxanekê daku şivê bixun. Piştî ku em rûniştin bi çend deqan, me dît camêrek hat ser masa me. Min ew camêr nasnedikir, lê Mela ew nasdikir.

Piştî ku me li hev pîrsî. Mêvan me bihev da naskirin.

Got **"va camêra filankes e, demek berpisiyarek ji xebatkarên filan partiyê bû, lê niha dev jê berdaye, êdî di mala xwe de rûniştîyê û dibê ez kurd im"**

Camêr pêşî li çavên mêvan û dûvre jî li çavên min nihêrî û bi ken got: **"Kekê Mela tu li M.H. nenhêre, ew tim tişta nivcû dibêje."**

Min pîrsî, nivcûû? Çawa yanî ?

Got belê nivcû dibêje, ez tenê ne kurd im, **belku ez hem kurd im him jî kemalîst im**, yani kurdek kemalîst! Got û wiha û dest pêkir:

"Dema ez zarok bûm û nû diçûm dibistanê, mamostên me, ji me re pîrr behsa Ataturk dikirin. Wisan ketibû sere me ku ger mirov nebe kemalîst mirov ne însan e. Piştî demekê ez çûm medresê. Seydayê me jî behsa Mela Mistefayê nemir dikir. Min piştî xwe da kemal û berê xwe da M.Mistefa Barzanî. Demek şûnve PKK derket. Gelek propagandayê xweş dikirin. otonomi nabe, federalî nabe, vava îxanet e. Baş ev e ku em **Kurdistanek Serbixwe** ava bikin ji hemî parçeyan!

Ez fikirîm min got welle ev ji hemî baştir e. Min jî wek gelek got bijî Serok Apo.

Her çiqas carnan digotin **biratiya gelan jî**, hinekên din digotin va siyaseta, taktîka. Min jî serê xwe dihecand. Lê dûvre derket ku Kurdistan û serbixwetî

taktik bû. Esas biratiya gelan pewîst bû bo me. Min dev jê berda. Min got dîsa çi hebe li Başûr heye.

Çawa hebe rêya Barzaniyê nemir e!

Îja ez niha dinhêrim way ku berpirsiyarên me yên Başûr jî behsa biratî û dostiya tirk û kurdan dikin, wek ku panzde sal berê pkk çawa bahs dikir û dûvre got hima kemalîzm tenê bese! Ez ditirsim ku deh sal şûnve jî, îja **Başur bêje biratiya tirk û kurdan liser esasê kemalîzme baştir e**, bijî biratiya tirk û kurdan bijî kemalîzm!...

De îja min efû kin salê min çûn jorê. Tim xelkê digot û min dida peywan wele îja min dil heye hima ji niha ve **ez bêjim ez kemalîst im, ma ezê çima 10-15 sala sebir kim!**"

Min got bira welle Bakur û başûr ji te xeyîdîn û kemalîst jî hêj te nasnakin, halê te pirr xirav e ! Camêr em gelek dan kenandin. Belku min di jiana xweda wek wî mirovek bi esprî nedîbû. Gellek tişt gotin lê naxwazim hemiyan di vir da binvîsînim. Ewî, ji wek ku min nivîsiye baştir digot, em ji kena ji xwe çûn.

Jin kuştin

Xwedê mirova neke tora mirovên nebaş, çi mêr dibe
çi jin.

Mirovek hebû nava wî û jina wî tunebû. Dixwest bi
awakî xwe ji jinake xilaske, lê çawa?

Rojekê jina wî serma girt û nexweş ket. Jinikê kirin
nava ciya.

Gazî xesiya xwe kir, ji xesiya xwe ra got: "Xesiyê qîza
te nexweş e, em nobeta wê bigrin, dibe ku bimre
Xwedê neke."

Xesiyê got na lawo, hinek serma girtiye, emê bidin
xûdanê, wê derbasbe."

Zava got "na, em dîsa nobeta wê bigrin. Ger xewa te
heye tu razê, ezê bisekinim."

Xesiyê got "na xewa min tune, tu razê, eze nobeta
wê bigrim, ku xewa min hat, ezê gazî te kim."

Mêrik ket nava ciya xwe teland, di bin çavda xesiyê
kontrol dike, ka çi dem xesî razê.

Demek şûnva xesî raza.

Mêrik rabû balif da ser devê jinikê heya fetisand.

Careka din çû ket nava ciyê xwe.

Lehzek din kuxiya, xesî jî hişyar bû. Camêr rabû ser
xwe, çû destê jina xwe girt û qêriya ser xesiya xwe
"tu çawa razayî û jina min miriyê hay te jê tune, wey
bavoooo wey birawooo ax liminnn."

Wisa qêriya wisan giriya xesiyê terka qîza xwe kir, da
berdilê zavê!

"Lawo qurbana te emrê Xwedê ye sebir bike!"

Jin jî li mêrê xwe dixin

Dema ez nû hatibûm Almanya carnan diçûm bajarê Kale mala cîranek me yê welatî.

Du malbatên kurda yên din jî hebûn. Em carnan dicivyan me sohbet dikir. Navê yekî Xalis bû.

Rojekê em li mala Mistefa ne, min got Xalis dibên xanima te li te dixe rast e?

Xalis got "na seyda kî dibê?"

Min jî henek kir got "Misto dibêje."

Xalis got " welle Misto derewa dike, xanima min li min naxe."

Min got Xalis ma eyb nîne ku xanima mirov li mirova xe, xanimê me hemiyan li me dixin.

Xalis got " ya Misto jî lê dixe?

Min got erê wî. Lê xanimên me bi sivnîka li me dixin, Misto dibê xanima Xalis bi dara lêdixe, rast e?

Xalis got "Seyda welle Misto derewa dike, xanima min jî xwe du caran li min xistiye, herdu caran jî bi sivnikê bû, dar derew in!

Ka binhêre tu kavirê min jî dibînî?

Li Bongila du gundê kurmanca hene di çiyê de. Ji wan gunda mirovek kavirekî xwe dibe Gêncê ku bifroşe û ji zarok û malê re hinek mesrefê bike. Dema diçe nêzîkî Gêncê dibe wextê nimêjê. Bi xwe bix we dibêje baş ew e ku ez nimêj bikim paşê dakevim bajêr.

Destmêja xwe digire û kavirê xwe bi hesineki mezin ve girêdide, dema li ser nimêjê ye, deng bi hesin dikeve. Dema nimêj diqede selam dide dinhere ku ne kavir û ne jî hesinê mezin tunene.

Ji hinek mirovên dimilî li wan dera dipirse.

- Lo birano min kavirê xwe bi hesinekî ve girêda û nimêjkir, piştî nimêje ne hesin û ne jî kavir tune ne gelo kuva çûn, hun dizanin!

Yek dibêje xalo ew hesina navê wî tiran e, wê demê sekinîbû lê dûvre birêket û çû, kavirê te jî pêre çû.

Xalo pir xemgîn dibe û diçe bajêr otelekî. Lê nakeve nava ciya hima bitevî pota xwe di bin karoliyê de dirêj dike.

Lehzek din xwediyê otelê dinhêre ku xalo tune, radibe wê odê dide camêrekî din.

Camêr jî nû zewiciye xanima xwe girtiye hatiye seyranê.

Camêr bitev jina xwe va, li ser ciya xwe dirêj dikin.
Mêrik dixwaze hinek ji jina xwe re îltifatê bike û jê re
dibê: "Xanima min dema ez li çavên te dinhêrim hemî
Kurdistanê tê da dibinim."

Dema ev gotina tê guhê xalo, hima di bin karyolê
diqêre dibêje " biraziyê min, heyrana te bim, ka baş
binhêre tu kavirê min jî dibînî an ne?

Bûk û zava ji tirsê direvin terka odê dikin, dibên cin
hene li vê odê!

Kalikê min li ser nanê yekî dibû!

Dema ku yek bi nezanî doza tişteki bike, yanî hay jê tunebe, hima bi tabîra gel ezbera bi axive liser wî va pêkeniya dibêjin.

Dibên du heb feqîr neçar (Evdo û Hiso) hebûne, behsa xwarina şêrîn dikirin.

Evdi got: "Zanî Hiso tişta herî şêrîn çiyê?"

Hiso got: "Welle ez nizanim, ka min di jiyana xwe da tişteki şêrîn nexwariye."

Kuro Evdo tu zanî tişta herî şêrîn çiyê?

Evdo got: "Erê ez dizanim helaw e helaw!"

Hiso got: "Te li ku helaw xwariye, çawa dizanî?"

Evdo got "Kalikê min li Bilîsê li ser nanê yekî diye.!

Keçika Kurd

Çend roj berê, min telefîzyon temaşe dikir. Kalekî tırka ku dema qetlîama Dersimê da li wir esker bûye, wiha diaxivî. (1938-39)

Me li gundekî Dêrsimê agir berda malekê.

Ha ku min dît keçikeke 7-8 salî, bi lez û bez ji nava malê derket û agir bi kirasê wê bû, dixwest ji xwe agir xilaske.

Dema keçikê em (leşkerên Tirkîyê) dîtin, careke din bi şûnde vegriya û çû nava êgir.

Em jî li wirê man heya ku hemî şewitîn, paşê jî xanî tepişî.”

Kifte û qulên gorrê!

Dibên Evdokî pirr tima hebûye, di jiyana xwe de, tu wext xêr nekiriye û sedeqan nedaye. Her çiqas xelkê jê re digot "**tuyê rojek bimrî û pewîstiya te bi xêr û xêratan hebe**" jî, wî guh nedida kesî.

Rojek ji rojan li ber derî xwe kiftan dixwe. Yekî rêwî derbas dibe, sitûyê xwe xwar dike, dibê "ez pirr birçî me va 3 roj e min xwarin nexwariye, gelo dikarim tev te xwarinê bixum?" Evdo kiftekî dide rêwî. Rêwî spasiya wî dike û diçe.

Dema ev Evdo yê tima dimre gorra wî qul dibe, bi sedan qûl çêdibin û ji hemî qulan agir tîne (ser da dibare). Evdo dizare "gelo kes tune min ji vî agirî xilas ke"?

Melaîketek dibê li vir kes tune, ger xêrên te hebin ancex ew li hewariya te werin, "gelo te qet xêr kiriye"?

Evdo dibê min di jiyana xwe de yek kiftekî sedeqe dabû rêwîkî.

Melaiket dibê de gazî kifta xwe ke.

Evdo dibê "Lo

kifteee!"

Kiftê tê.

Evdo dibê "van qulan bigre, agir min dişewitîne."

Kiftê reben, kijan qulê digre yê din vekirî dimînin.

Evdo dibê "kifte bextê te da me kifteeeeeeeee!.."

Kiftê dibi "ez çi bikin, kifte yek qul hezar, kîjanî bigrim kijanî negrim?"

Kûçik çima diewtin?

Xweda yê Teala her tiştên ku afirandiye, miheqqeq jê ra sedemekî heye. Tu tişt bê sedem nahatine afirandin. Hinek tişt em sedemên wan dizanin lê hinekan jî em hêj sedemên wan hînebûne. Çi em sedeman bizanibin û çi jî em nizanibin, gerek em bizanibin ku, wan tiştana ji bo hinek wezîfeyan û ji bo hinek menfeetên mirovaniyê hatine afirandin û roj hebe emê sedemên wan bizanibin!... Hunê bêjin gelo Xwedê çima kûçik afirandiye?

Dibêjin ku Hz. Mûsa rojekî ji gundê xwe derketiye û çûye gundekî dinê, ji bo ku Dînê Xwedê teblîxî wan bike.

Dema Hz. Mûsa çûye ber gund, hemî kûçîkên gund hatine pêşîya Hz. Musa û awtiyane Wî.

Hz. Mûsa çiqas xwestiye ku biçe gund jî, kûçîkan hemî gotina xwe kirine yek û awtiyane Wî û nehîştine ku Hz. Mûsa biçe gund.

Hz. Mûsa bala xwe didê ku çare tune, difikire dibêje ez bi vana ra biaxivim, belku min nasbikin û ji çûyîna min re astengiyê dernexin. Dûvra gazî wan dike:

-Gelî kûçîkan! Ez Hz. Mûsa me, Pêyxemberê Xweda me, hatime gundê we, ji bo teblîxa Dînê Xwedê bikim, ev wezîfa min e, Xwedê wisan emir kiriye, bihêlin ez wezîfa xwe pêkbînim!

Kûçîkan li çavên hevdu mêzekirine û yek ji wan parê pêşda hatiye û bersiv daye:

- Ya Hz. Mûsa em te nasdikin û em dizanin ku tu Qasidê emrê Xweda yî, lê em jî mexlûqên Xwedê ne û Wî em jî afirandine ku em jî hinek wezîfa pêkbînin.

Wezîfa me ya herî mezin ev e ku, mirovên nenas werin gund em biawtin wan û xwediyan xwe bihatina nenasan bidin hesandin. Gerek tu li qisûra me nenhêrî, ger em wezîfa xwe pêkneynin em birçî dimînin.

Hz. Mûsa dibêjê:

Heqê we jî heye, lê we wezîfa xwe pêkanî, de încê bihêlin ez derbasî gund bibim.

Kûçik dibêjin:

-Ya Hz. Mûsa hêj wezîfa me temam nebûye, gerek em bi ewtin te û tu jî darê (asa) xwe li dor xwe bigerînî ku hinek ji me bi te negirin, ta ku em bi hevra biçin gund. Dema em çûn gund, wê xwediyan me werin pêşîya te, me ji te biqetînin. Wê demê wezîfa me xilasdibe û tu dikarî dest bi wezîfa xwe bikî!...

Kusî û Rûvî

Kûsî û Rûvî bûbûn bira. An jî destebira dibên li hin herêma. Biratiya wan demek dirêj domand.

Rojekê rûvî got "birê kûsî were em îsal hinek genim bajon, ji ber ku zivistana em birçî dimînin." Kûsî got "baş e bira"

Genim ajotin. Ew sal, salek gelek bi bereket bû.

Baran dibarî çandinî gelek gurr û xwirtbû, similan ji yekê bist-sîh didan.

Dema çinîne hat, herdu bira genimê xwe çinî, kutan û libakirin, genim û ka ji hevdu qetandin û her kê danîn alîkî.

Rûvî xwest planek li serê kûsî çêke, dilê rûvî heye genim ji xwe ra bigre ka jî bide kûsî. Rûvî dest bi axavtinê kir û di navbera wan da xeberdanek wiha çêbû.

Rûvî: Bira ez dixwazim em genim û ka li hev parvekin tu çi dibêjî?

Kûsî: Tu zanî keko, çawa dixwazî em wisa bikin.

Rûvî: Bila genim ji birayê mezin ra ka jî ji birayê biçûk ra be, tu çi dibêjî?

Kûsî got gelek maqûl e. Ez qebûl dikim.

Dor hat ka kîjan bira mezin e. Liser meznatiyê bi hev nekirin. Dawîda rûvî got em bi çin cem zanyarekî bila ew hukim bike.

Rabûn çûn cem zanyarekî zeman, mesela xwe jê ra gotin lê keske ku bizanibe kîjan mezine tune, şahid tune delîl tune zanyarê reben çawa hukim bike.

Demek hat aqilê zanyar got "madema ku hun herdu jî dibên salên me pîrr li jor in, wê demê ezê hin bûyerên li cîhanê qewimîne bêjîm ka kîjan ji we wê çaxê hebûye.

Zanyar pirsî gelo dema Eyûbiyan da hun hebûn?

Herduyan bi hev ra gotin belê em hebûn

Zanyar pirsî gelo di dema Hz. Muhemmed da hun

hebûn?

Herduyan gotin belê em hebûn

Zanyar pirsî got gelo di dema Hz. Îsa da hun hebûn?

Herduyan jî gotin belê em hebûn.

Êdî zanyar aciz bû û pirsî.

Birêz rûvî di dema tofana Nûh da tu çend salî bûy?

Rûvî got ez wê demê xortek çardesalî bûm.

Zanyar berê xwe da kûsî, bala xwe dayê ku kûsî digrî.

Pirsî birêz kûsî tu çima digrî?

Kûsî got "ez negrîm kî bigrî? Dema we behsa

tofana Nûh kir herdu kurên min hatin bîra min. Dema

em sarê gemiyê bûn min kir nekîr du heb kurê min

sar nebûn û herdu jî di avê de xeniqîn."

Zanyar got salê wan çibû?

Kûsî got yek 14 salî yek jî 16 Sali bû.

Yanî yek 2 salan ji rûvî mestir!

Bi vî awahî pilana rûvî ket avê. Kûsî bû birayê mezin

û genim ji xwe ra girt.

Bo vî dibêjin ku "**kî çalek ji hevalê xwe ra bikole,
ew bi xwe dikevê**"

Kurd ji sor hezdikin!

Mirovek ji Serheda me li Parîsê dijiya.
Rojek kincên xwe lixwe kir û derket sûtê.
Li serê çarêki dixwest derbasî wiyalî be. Lê li hember,
lemba sor pêdiket û polêsek jî li serê çarê sekinîbû.
Camêr qet rewşa xwe xirav nekir û di lemba sor de
derbasî wiyalî bû. Çû ku ji polês derbas be, polês bi
millê wî girt.

- „Camêr tu di lemba sor de derbas bûy, ev jî qedexe
ye, pewîst e tu deh Euroya ceza bidî.“

Camêr dest kir cêba xwe û bîst Euro derxist da polês.
Polês got „perê hûr tune deh Euro bide.“

Camêr got „hinek sebir ke, ku lemba sor pêkeve ezê
dîsa derbasî wiyalî bim û dehek din jî boy vê bigre.“

Polês bawer nekir, ecêb ecêb li camêr nihêrî.

Dema lemba sor pêket, camêr dîsa di lemba sor de
derbasî wiyalî bû û destê xwe ji polês re hejand û
got:

- **„Em herkes gihîştin heqê xwe?“**

Kurê min ma bê peyxember:

Dibên kurê jineka file miriye. Jinikê şîneka pîrr xerîb dîkir.

Cîranên wê, ewê tesellî kirin û gotin de **way miriye û çûye ber rehma Xwedê, gihîşt Hz. Îsa û çû cennetê, êdî ewqas xema neke.**

Jinikê got ez boy mirina wî nagrîm. Beriya mirina xwe bi panzde (15) rojan bûbû misliman. Îsa jê xeyidiye, Mihemed jî hêj nasnake.

Kurê min ma bê pêxember loma ez ewqas digirîm.

Laçika jinê

Dema ez li Vartoyê îmam bûm, ez û xanima xwe em diçûn Erzurimê. Xanim nexweş e, dibim wir. Wan dema bi otobusê ji Varto heya Erzurimê heft saet rê dikşand. Xanima min qet xeber nade, tiştê bipirsî bersiv dide an wisa bê deng e.

Ew li ber pacê ye, ez li alî hundir im. Her wiha camêrekî jî li alî din ew xanima xwe rûniştine. Ez fikirîm 6-7 saet bi bê dengî derbas nabe. Baş ew e ku ez û camêr hinek sohbetê bikin.

Ez zivirîm alî wî û di navbera me da sohbetek wiha derbas bû.

Min: Bira oxirbe kuva?

Wî: Ji te ra jî oxirbe, welle heya Erzurimê. Lê tu?

Min: Ez jî heya wir diçim.

Wî: Xêr e însallah?

Min: Xanim nexweş e, salê carek duduya ez tînim Dr. Gelo te xêr e?

Wî: Welle ez jî wisa, xanim nexweş e, Xwedê nexweşiyê neke mala, zehmet e.

Ew dem hat aqilê min, ku ez henekekî bikim daku sohbet germ bibe, em bikenin.

Min: Gelo rêkî ku em ji van jinên nexweş xelas bin tune?

Wî: Ez nizanim, ku rêkî heye tu bêje, em çawa xilas bin.

Ez dil xweda fikirim, min got way camêr jî heneka dike, baş ew e em heneka xwe bibin serî.

Min: Em vay diçin ber çemê Eres, were em herduyan bavêjin çemê Eres, bila bimrin, em biçin Erzurimê, çend rojan li wir bimînin. dûvra

werin mal. Dema xelkê pirsî emê bêjin Xwedê heqiya wê anî mir, nexweşîkî nebaş bû, belediyê cenaze neda me, li wir veşart.

Dema min wisan got, camêr xwe şidand û got:

Wî: Tu nakî!

Min: Kî neke laçika jina wî li serê wî be.

Dema min ev gotin got, xanima wî enişkek li kêleka wi xist, zivirî alî xanima xwe. Xanimê jêra tiştek got. Camêr berê xwe da alî jinikê êdî hew li min nêhêrî û hew axivî.

Xanima min got: "oxx dilê min rehet bû, de îja tu bi kêra xeber bidî ta Erzurimê.

Em heya peyabûn jî camêr êdî li ruyê min nenhêrî :)

Lingên beqê çend heb in?

Li welat demên berê ne radyo ne tv û ne jî cîhkî taybet bo gundiyan tunebû. Evar êvaran diçûn malên rûsîpiyên gund sohbet dikirin. An jî ku hebana dengbêjan sitran digotin.

Rojekê li gundekî dîsan gundî li mala rûsipîkî civiyabûn behsa heywanan dikirin.

Yekî pirsî gelo çend lingên beqê hene?

Herkesek tişteki got.

Hinekan gotin çar lingên beqê hene.

Hinekan gotin nexêr du ling û dudu jî destên wê hene, lewra herdu dest ji herdu lingan kurttir û biçûktir in.

Yên din gotin nexêr dema beq birêda diçe liser her çar lingan dimeşe, ku dest bana liser nedimeşyan! Sohbet dirêj bû û gundiyan bihev nekirin.

Gotin baş ew e em ji rusîpiyan pirsikin.

Belê pirsîn lê rûsîpiyan jî bihev nekirin.

Ling dudu ne, an çar in.

Dawî da yekî got rûsîpiyê we nizane derewa dike.

Yên din gotin çawa ji rûsîpiyê me ra dibêji derewîn?

Herdu qebîla lihev xistin, dûvra dest avêtin silehan û berdane hevdu, ji herdu qebîlan heft mêr hatin kuştin ji boy lingên beqê!

Mixabin em kurd ji hevdura mêrxas in, xelk heroj bi parta ji me dikuje em deng nakin, lê em gotinek bira yê xwe yê kurd qebûl nakin!

Li qirarekî nasekinî heya ji te ra kirasek bidrûm!

Melê meşhûr rojek fikirî got ku; di laşê min de tu ciyê bê pot tune, lê hevalê min yê biçûk tenê bê kiras e, ezê jê ra kirasek bidrûm.

Rojek çû cem dirûnkerekî (terzîkî) û bi wî prova kirasek ji hevalê xwe re girt. Terzî kiras dirût da mela. Mela kirasê xwe girt hat mal. Wê rojê xanima wî xwe gelek xweşik kiribû. Mela ket himêza jinikê, lehzek şûnve kiras ji hevalê wî re biçûk hat. Mela hima rabû bi wî halî dîsa çû cem terzî. Terzî kirasek mezintir dirût da mela, lê dema kêfa mela şikest dît kiras mezin e.

Melê meşhûr bixwe bixwe hêrs bû û wiha got:

"Kambax tu li qirarekî nasekinî heya ku mirov ji te ra jî kirasekî bidrû!"

Va pêkeniya liser mirovên ku li qirarekî nasekinin tê gotin.

Hinek mirov hene rojê tiştek in, rojek, hunermend, rojek siyasetmedar, rojek rewşenbîr uwd. Her wiha hinek jî rojek musliman, yek demokrat yek sosyalîst!..

Bi vê pêkeniyê mirov him li wana rexne dike û him jî wan hinek biçûk dike.

Bi hêviya dilxweşiya we!:)

Mastê kerê û Mehmet Xan

Mehmet Xan hevalekî baş kurdekî me yê ji Meletiyê ye.

Rojekê em rûniştibûn li kafateryakê li Almanya Dortmundê. Ewî bîranînek xwe wiha ji me ra got: "Dema ez xort bûm, me li bajarê Mûşê rêya hesin çêdikir.

Li rojavayê Mûşê bi navê Çizmehurnu îstasyonek heye. Me li wir kar dikir. Yekî ji me ra her hefte mastek pirr xweş danî.

Demek wisan domand, lê rojekê êdî ew mirova nahat, ew mastê ewqas xweş qediya.

Piştî mehekê li bajêr em rastî wî hatin.

Me got camêr tu çima êdî nay, me bêriya mastê te kir.

Camêr madê xwe kir got:

- "Mixabin kera min mir."
- Çi? Ew masta mastê şîrê kerê bû?
- Erê welle!

:)

Minê di bavê xwe jî...

Rojek em çend heval li mala Seydayê Mela Evidirrehman Durre bûn. Demek şûnve jê re telefon hat. Pêşî baş axivîn lê dûvre seyda hêrs bû, got „ew kî ne lawoo ku min tehdît bikin, ezê di wan û bavê wan....“

Me zanî seyda gelek aciz kirin, lê me qet tişt nepirsî. Ev bûyer çend sal berê bû. Di wan deman de seyda tim dihat mala me, hima heftê 2-3 roja li mala me bû. Wî Şerha Dîwana Xanî civandibû, min jê re dinvîsî. Şerh niha hatiye çapkirin, pirtûkek gelek mezin e jî. Lê, wi digot min jî dinvîsî, ev şerha herfo herfo bi tiliyên min hatine nivîsandin.

Jiber ku xal û xwarzîtî di navbera me de heye, (ew badikî ye, pismamê xalanê min e) nava me gelek xweş e û boy xwarzîtiya xwe carnan ez jê ra hinek tiştên taybetî bêjim jî, ji min naxeyide.

Rojekê min got “xalo zanî çima badika çêrî dê nakîn û yê bavê dikin?”

Got çawa?

Min got dema eşîrên kurda hêrs dibin, dibên min di diya we... Lê dema badika hêrs dikevin dibên min bavê we.. Heya we jî rojek wiha da xebera!.. Dema ji were telefon hat û we tehdît kirin!

Fikirî got rast e, lê ta niha ez ne fikirîm ka çima badika ji bavê ra didin xebera!

Min got; ku destûra we hebe ezê sedemê wê bêjim, got bêje.

Min got: Dibên yekê badikî zewiciye, lê cara berê xwe bi jina xwe de nekiriye û ranezaye. Tim dikeve nava ciya û piştta xwe bi jina xwe de dike û radizê.

Jinik çend meha berxwe dide, lê dawî de difikire ku “ez mêrê xwe bibim doktor, bi dizî ji doktor ra meselê

bêjim, belku ew guhê mêrê min veke”

Rojek ji sibê de dest pê dike “ay mêrik pišta min û zikê min dêşên!..” Va çend roja wiha didomîne, dawî de mêrik dibêje “ka ez te bibim doktor”

Gund li çiyê ye û di nava deviyên de derbas dibin, mêrik dibê “tu nexweş î ditirsim ku tu bimrî, de were ez carek tev te razêm, bila ew hesreta bi me re nemîne, paşê em biçin doktor”

Piştî razanê mêrik dibê “welle va tişteke gelek xweş e, çima em heroj nakin?” Jinik dibê “tu zanî, dema dixwazî ez heroj di paxila te da me.” Mêrik dibê piştî em ji doktor werin ku tu baş bî, emê heroj razên.”

Paşê dikevin rê, hinek diçin jinik dibê “pišta min baş bû.” Lehzek din jî dibê “zikê min jî baş bû, em neçin doktor”

Mêrik dibê “wey hima bi carek tu baş bûy?”

Par vî çaxê bavê min jî nexweş bû, ew jî zik û pišta wî dêşiya, paşê jî pê mir, min bizaniba minê di bavê xwe jî...

Aha Xalo mesela ku badika ji bavê re didin xebera ji vir hatiye...

Xalê min gelek keniya, got “welle ez ne bawer im ji wir tê, lê temsîl gelek xweş bû”

Min got hespê bîne te ker anî!

Li welatê roma ji paşayên 12 Êlûnê paşayek bi navê Tehsin hebû. Tehsîn paşa rojek li qizilaya paytext digeriya û çû ber hêkeli Kalê Roma. Dema li derdorê hêkel digeriya dengê hatê.

- Lo Tehso kuro ji min re hespekî bîne ezê ji vî welatê birevim!

Tehsin li derdorê xwe nihêrî kes nedît! Hella hella va çî ecêb bû. Kes tune û deng heye. Paşa wiha difikirî lê deng dîsa hatê.

- Lo Tehso kuro min got here ji min re hespekî bîne ezê ji vî welatê birevim, ma deng nay te? Tehsin li hêkel nihêrî bala xwe dayê Kalo diaxive. Tehsîn ji kêfa mabû bifire. Ta niha digotun Kalo naaxive lê îro way bi wî re diaxive! Tehsîn çû ber hêkelê kalo;

- Kalê me ez qurban tu çima acizbu yî ji me? Kalo pîrr hêsketiye û got:

- Law kî li vî welatê gûkî dixwe, dibê dustûr û îngilabên kalo ye. Li vê dunya hanê jî dara di min re dikin, ezê ji ber van bêbavan birevim.

Tehsin got ser çava kalo ezê hespekî bînim. Tehsin got û birêket, him diçe him jî difikire, "ezê vê bûyerê ji serokê xwe Kenno paşa re bêjim ka ew çî difikire.

Dema Tehsin paşa çû cem Kenno paşa û jê re bûyer got. Kenno got ku emê sibê bi hev re biçin ka Kalo çî ferman dike.

Roja din bihev re çûn qizilayê ber hêkelê Kalo. Herdu mane heyri ka çî dem deng ji hêkel derkeve. Lehzek din dengek hat;

- Lo Tehso, hey kerê kurê kerê!. Min duh ji te re got biçe ji min re hespekî bîne ezê ji vî welatî birevîm, lê te çî kir? Te çû kerek anî!..

Nan deynin ser çi?

Şeyx Elîyê Qula (1) bi tevî hinekan xwarinê dixun, sifre li erdê ye. Herkesên ku bixwaze kevçiyê xwe deyne, datîne ser nan, danaynin ser sifrê. Lê Şeyx Elî kevçî datine ser sifrê.

Yek dibêje

-Şeyxê min, gelo çima hun kevçî danaynin ser nan, nan ne paqijtir e ji sifrê?

Şeyx dibê "ma ku nan biqede û xwarin jî hêj bimîne hunê kevçî deynin ser k.... min:))

Va pêkeniya bi gelemberî liser kesên ku piştî xwe bi hinekan girê didin, ji kîsê xelkê mêraniyê dikan, boy wan tê gotin.

(1) Qula gundeki Vartoyê ye, Varto jî qeza Mûşê ye.

Navê diya Musa

Rojekê ez û şehîd Seyda Mela Mehyedînê Domê em li derê qehwa wî rûniştibûn.

Ma çay vedixwar, me dît ku hecîkî bi alî me va hat.

Li cem me rûnişt. Me jê ra çay xwest.

Heciyê me hi çay veduxe hîm jî got "ez dixwazim ji we herdu mela pirsekê bikim."

Seyda got "heci çaya xwe vexwe û here, tu yê pirsra çi bikî?"

Hecî got "welle mereqa dikim Gelo navê diya Mûsa Pêyxember çiyê?"

Mela Mehyeddîn li çavên min nêhêrî kenîya got "tu çi dibêjî?"

Min got: "Seyda dizane."

Seyda got: Navê diya Mûsa Pêyxember Xemlê bû!

Hecî got "hella hella ma Xemlê kurdî nîne?"

Seyda got "Heci ji xwe diya Mûsa aleyhisselam kurd bû."

Hecî got "welle hun henekan dikin, ez bawer nakim."

Seyda got "madem tu bawer nakî tu bêje navê diya wî çi bû?"

Hecî got "welle ez nizanim."

Seyda kenîya got: "Hecî dizanê tu bêje, ger nizanî navê diya wî xemlê bû."

Hecî li çavên min nêhêrî, dît ez deng nakîm, wî jî xwe kerr kir. Lehzek şûnva rabû çû.

Seyda ji min ra got: "Aha ez xalê teme." ;)

Nanê nîvrojê

Dema em ji derva diketin îmtihana Îmam-Xetîbê li wir min hevalekî gelek baş naskir. Sal 1975 bû.

Mela Abdulhekim Deniz Ji Milazgirê ji gundê Xirbe bû.
(Xirbê Quddus begê)

Rojekê ji min ra got: "Tu misafirê min î, emê bi hevra biçin Milazgirê."

Min jî qebûl kir û em çûn wê derê.

Li Mûşê nîvrojê normal saet 12:00-13:00 dixun, lê li Milazgirê wan deman saet 15:16'anda.

Em li mala wan mêvan in, saet bû 12:30 çavên min li derî ye ka çi dem sofrê raxin. Min dît dengê kevçiya li ber derî hat. Min got way nîvroj tê.

Sekinîm saet bu 13:00, îja jî dengê tebaxa hat.

Ez wisan ber xwe didim, carek taş, carek kevçî, carek sînî, ta saet bû 15:00 paşê nîvroj hat.

Mela Abdulhakîm:

Mela bibuhure, nîvroj derengî ket, hêvîdar im tu pîr birçî nebûyî.

Min got: Heyra ew çibû carê dengê tişteki li ber derî dihat va bû sê saet we nû amadekir?

Got: Min xuşka xwe û xanima xwe tenbîh kiribû. Min got li Mûşê nîvroj zû tê xwarin, hun carnan li ber derî kevçiya lihevxin dakû Mela Nûredin ber xwe bide ta nîvroj amade bû.

Em gelek kenyan!

Newroza Kurda

Leşkerê dijmin hey li Mamosta şkençe dikirin hem jî jê dipirsîn:

-Tu çi dixwazî?

Mamosta bersiv da; "Ez ji we tişt naxwazim, we min anî vira, herhal hun ji min tiştêk dixwazin!..

- Belê em dixwazin, gerek tu ji doza Kurdistanê biborî û carek din behsa Kurd û Kurdistanê neki !..

Mamosta got: "Ez mirovek im, ji tirsê, an ji bê quwetî ez dikarim biborim, an bêjim belê ez borîm û hew deng bikim, lê gelê kurd ji doza xwe derbas nabe!

Leşkera gotin :

- Êêê hun dizanin, emê jî roj biroj we bikujin heya ku hun biqedin!..

Mamosta got: "Em zûbizû naqedin lê hindik ma ku hun biqedin û ji dîrokê bîn verotin !

Leşker kenîyan û bi mamosta henek kirin,

- Na lo çend roj ma?

Mamosta got: "Roja Newrozê".

Leşkera kenê xwe zêdekirin û gotin herhal me pirr li serî xist, sere wi tevlihev bûye, nizane çi dibê û pirsîn;

- Newroz ma du meh! Emê çawa biqedin, çawa ji dîrokê bîn verotin?

Mamosta bişirî û got:

"Ferq nake, roja ku hun biqedin emê wê rojê carek din Newroz îlan bikin"!

Nimêja eydiyê dubare dibe an ne?

Wek hun jî dizanin rojên cejna rojên qerebalix in, mirov diçe malên dost û heval û eqreban uwd. Kesên ku carnar be jî nimêj bikin, roja eydiyê sibê zû diçin mizgefta. Ew mizgeftên ku heroj vala ne, roja eydiyê tije dibin. Pîrr kes nizanin nimêj jî bikin hima çawa rast lêhat;))

Car heye melayên mizgeftan jî xwe şaş dikin, wek hin kesên ku di jiyana xwe de qet nimêj nekiribin. Gelek kes jî, herçiqas di mizgeftê de bin jî, ruhê wan ne li wir e, tew nizanin ka mela di xutbeya xwe da çi xwend û di wazê xwe de çi got, belku wê roja mela jî wisa be;))

Di vê pêkeniyê de ezê behsa mizgeftekî li bajarekî Almaniyê bikim.

Vê sibê kurdên bajêr û derdorê bajêr pîrrên wan li mizgeftê civîyabûn. Eh wek hun texmîn dikin karê yekem topkirina fitra bû ji boy mizgeftê. Lê karê duwemîn nimêja eydiyê û xutba mela bû.

Dema rabûn nimêj kirin, piştî nimêje yekî got „mela gelo te çima di rekata dudya de Fatihe nexwend?“ Mela got “min xwend,” camêr got “na wellahî te nexwend.” Pîştî îxtilafa nava mela û wî camêr, îja ji cemaetê hate pîrsîn “gelo mela di herdu rekatan de jî fatihe xwend an ne?”

Mixabin kesî nikarî bersiv bida, lewra tu kesî nizanîbû ku mela xwendiyê an ne;))

Serokê Civakê bixwe jî li wir bû.
Wek xwendevan jî dizanin, ji şertên nimêje yek jî
xwendina fatîhê ye, ku ney xwendin nimêj nabe.
Mesela hat ser çareserkirina pîrsgirêkê;))
Pirsgirêk wiha hate helkirin.

Madem ku kes nizane mela fatihe xwendiyê an ne,
baş ew e ku emê nimêjê carek din jî bikin. Bi vi awahî
nimêj dubare bû, lê gelo vê carê mela dîsa fatihe
xwend an nexwend kes jê behs nake ;)

Nimêja Îniyê

Sala payîza 1982'an bû. Em sê Îmam ji nava Vartoyê sirgûnê Milazgir û Kopê bûbûn.

Sedem jî, me digot "ku mirov bi peran bixûne xêra xwendina Quranê ji miriyan ra naçe."

Eva jî bû sedemê dijminiya şeyx û mela yên mewlûdxan, şikayetê me kirin, gotin van melana înkara qur'anê dikin, doza Kurdistanê dikin û me ji vartoyê derxistin.

Di wan deman da, melakî din jî sirgûn hatibû Xerabeşehrê gundê Milazgirê. navê wî jî Mela Abdurrahman bû.

Wî digot, rojekê gundîkî min li hember camiyê liber dangî bû. Min jê ra îşaret kir ku were nimêja îniyê. Serê xwe hejand got ezê werim.

Ez nîv saetî mam, nahat min dîsa îşaretek dayê, dîsa nahat. Cara sisiya min gazî kir got de were em nimêj bikin cemaeta me kêm e.

Ewî hêdika ji kurê xwe ra got: "Lawo va mela kurrê kerê rika xwe berdaye min, xwe bide ber dangî ez biçim du qoça li erdê xim û werim.

Pêxember qure nînîn!

Wek hun jî dizanin ku di piştî Pêxemberê me Hz. Muhammed ra gelek mirovên derewîn derketin û doza pêxemberiyê kirin.

Yek ji wan rojekê di nava civakekê da dîsa dawa pêxemberiya xwe kir û bi angorê eqlê xwe şirove dike û dixwaze xelkê îqna bike. Mirovek ji civakê got:.
- Heyra hemî pêxember mu'cizên wan hebûn, de ka tu jî mu'cizekî bide nîşan ku em bi te bawer bikin!..

Derewîn got baş e, de ka hun çî dixwazin?
Camêr got aha way dara tuyê li wira ye, gazî kê bila were cem me.

Derewîn çend cara got "Lê dara tuyê ez pêxember im, emir dikim ka were vira.

Lê mixabin deng jidarê nahat û birê neket.

Derewîn fêmkir ku wê derewên wî derkeve, îja jî wiha got:

-Gelî cemaeta camêra, wek hun dizanin di baweriya me de quretî tune û gerek pêxember qure nebin, ku dar ney cem me, emê biçin cem darê, bila quretî ji darê ra be:))

Pêyxemberê derewîn:

Sultan Mutewekkil bi tev wezirê xwe Hesenê kurê Îsa va rûniştibûn.

Yekê dawa pêxemberîyê dikir hat wir.

Mutewekkil got: "Ka mucîzekê nîşan me bide ku em bi te bawer bin!"

Derewîn got: "Ka jinekê bidin min, ezê nikah kim hima di cîhda bi hemle bimîne û zarek bîne."

Mutewekkil ji wezîrê xwe Hesenê kurê Îsa ra got: "Ka jina xwe bidê bila hima di cîhda bi hemle bimîne û zarek bîne."

Wezîr got: "Ey emirel mumînîn, ez bi pêxemberiya wî bawer im, kesên ku bawer nakin bila ew jina xwe bidinê."

Mutewekkil wisa kenîya heya ji ser textê xwe da ket xwarê.

Pêzeveng

Dibên li derdorê Stenbolê li qezakî biçûk li hotêlekê du kes pevçûne. Di encamê pevçûnê de yek ji yekî re dibê pêzeveng!

Ye din pirr aciz bûye û gotiye ezê te bikujim, tu çawa ji min re wiha xirav dibêjî.

Kesên li wir, ketine nav, ji hev qetandine. Lê camêr nasekine û kujim kujima wî ye.

Mirovek bajêrî radibe ser xwe û ji camêr re dibêje:

- Bavo tu lêxî wî bikujî bo gotinek, tuyê bikevî zîndanê, zarok bimînin bê bav, karê te ji dest te here!

Camêr dibê;

- Karê min tune, ha derva û ha jî hepis!

- De başa ku karê te tune, we re ez te bibim

Stenbolê, hotêlek min ya mezin heye, li wir kar bike ezê miaşê du memûra bidim te!

Lihev dikin û diçin Stenbolê, camêr dest bi kar dike.

"Karê wî ew e ku, "li hotêlî runîştîye, dema mêr têne hundir, radibe cakêtê wan bi darda dike, kîjan odê bixwazin nifta ode dide wan, dema ku ji jor de peya dibin, cakêtê wan li wan digre li xwe dikin û dibê hun ser çavan hatin, em li benda we ne ku hun carek din jî werin.

Belê kar êsan e û pere jî pirr e. Camêr ji hemî heval û dostên xwe re name dinvîsîne, "Hevalno birano karek min yê gelek rehet heye û pere jî pirr e, ez ketima xêra Xwedê."

Heval dinvîsînînin "de başe navê karê te çiyê? Tu xwediyê hotêlê yî, an tu mudir î, tu çî yî?

Camêr jî, navê karê xwe nizane, baş ew e, ji patronê xwe bipirse. Dema dipirse, Patron dibê navê karê te **pêzevengî** ye!

- Çawa ?

- Lê di hotêlê de jin hene, ew mêrên tên diçine cem jinan, tu jî wiha li ber derî ji wan re alikarî diki, aha pêzevengî wiha ye! Te dît kar rehet, pere zaf ! Te dikir yekî bo vê gotinê bikuşt!..

Camêr dibê „bavê min nizanibû pêzevengî wiha tiştê baş e, ger min bizanîba, minê bavê xwe jî, diya xwe jî, bira yê xwe jî, hemî malbatê bikira pêzeveng!..

Pere car heye hima her tiştî ji hinekan distîne, mirovên pirr ji malê dunyayê hezdikin, ha yji wan hebin!..

Qarişê karê xwediyê malê nebe!

Paşa û wezîrê xwe rojekê diçin nêçîrê. Heya êvarê digerin, dibînin ku malek tenê li serê çiya di nava daristanê da heye.

Paşa dibê em işev mêvanê vê malê bin, lê em xwe nedin naskirin.

Diçin malê dibin mêvan.

Mêrîk wê êvarê ji wan ra pezek şerjêdike. Sibê yeka din, nîvro yeka din, êvarê yeka din!

Dema li ser sifrê rûtinên, wezîr dibêje "**camêr ji duh da te çar pez şerjêkir, me hêj yek nexwariye, heyf e zêde îsrafê neke.**"

Xwedê malê ji ciyê xwe radibe, sîlekî li wezîr dixê û dibê "**qarişî karê xwediyê malê nebe.**"

Vaya pîrr zor a wezîr diçe. Lê serê çiya ye û vana jî xwe nedane naskirin.

Padişah dikene.

Evarê wezîr dibê "paşayê min em jî, ewî teklîf bikin bibin koşkê, ez belku heyva xwe jê bistînim."

Paşa dibê baş e.

Sibê radibin wê herin. Xwe bi mêrik didin nasîn. Eva ez wezîr vava jî padişah, em jî te dawet dikin, bibe mêvanê me.

Camêr qebûl dike.

Bi hev ra diçin koşka paşê, dor tê pîlana wezîr.

Wezîr dibê "paşa em jî, sifrê deynin, lê neçin ser sifrê belku mêvan birçîbe, bêje fermo werin ser sifrê, ez jî sîlekê lêxim, bêjim qarişî karê xwediyê malê nebe, xwediyê malê negot werin tu çima dibêjî.

Lê emê li paş xwarina xwe bixun bila mêvan birçî bimîne.

Rojekê sê carabn sifrê datînin erdê paşa û wezîr wek plana xwe naçins er sifrê, mêvan jî ne diçe ser sifrê ne jî dengê xwe dike. Bîstûçar saeta birçî dimîne.

Wezîr poşman dibe, dibê paşa yê min camêr rojekê ji me ra çar pez şerjêkir, me jî wî birçî hîşt. Baş ew e sibê ku dîsa dengê xwe nekîr, em werin ser sifrê gazî wî jî bikin, bila heyfa min jê ra bimîne.

Paşa dibê baş e!

Sibê sifrê datînin, herdu deng nakin, mêvan jî dneg nake.

Dûvra wezîr dibê: "**Paşa yê min fermo ser sifrê em jî mêvan jî birçî ne.**"

Paşa dibê belê fermo û diçe ser sifrê, wezîr jî.

Lê mêvan radibê diçe sem wezîr sîleka din jî lêdixe, û dibêje "**min ji te ra gotibû qarişî karê xwediyê malê nebe. Li mala min qarişê karê min bûy, li vir jî qarişî paşa dibî, vaya ne mala te ye.**"

Qelenê jina sed zêr

Rêwîkî diçe gundekî, dipirse gelo kî mêvana dihawîne?

Malek xanedan didin nîşan, diçe li wê malê rûtinê. Lehzek din du xortên egît tîn û destê xwediyê malê radimîsin. Dûvre diçin pişt derî li piya disekinîn û destê xwe pevdixin.

- Hun bixêr hatin berxên min we keçik xwest?
- Spas bavo, belê me xwest
- Gelo qelen çî xwestin
- Sed zêr xwestin, me da wan û xelata xwe pêdekir.

Dema mêvan "**qelen sed zêr**" sehdikeye ba berdikeve tirekê dike. Xwediyê malê fêma dike ku sed zêr jê ra pirr hat, loma wiha ket tengasiyê, jê dipirse.

- Gelo ma qelen li cem we çiqas e!
- Mêvan dibêje li cem me yek an du zêr e.

Xwediyê malê dibe :

Ka bala xwe bide van herdu xortan, vana herdu kurên min in û wek wan hêj 5 heb jî hene. Qelenê diya wan jî sed zêr bû. Kesên qelenê diya wan sed zêr bê jê egîtên wek van xorta peyda dibin, yên ku qelenê wan zêrek be tirrekê wek te jê peyda dibin ma şaşî di ku de heye?

Qijik çima diqijte

Gundî di bin siya darê da rûniştî bûn.

Qijikekî hat ser darê danî û xwend. Yani kire qijteqijt.

Hinekan gotin vava xêr e

Hinekan gotin en va şerr e, ev kambaxa çima qijtiya.

Gotinê wan berbihevdu çû rabûn lihev xistin.

Melayê gund di wir da derbas dibû. Ket nava wan ji hevdu qetand.

Got: "heyra em kurd bira ne yek, ya duduya em cîran in mal ava, boy qijikê mirov dilê hevdu dihêle? Ma ez li vira serê kerê me, ka ji min pirsikin xêr e an şerr e, sewab e an gunehê?"

Gundiya gotin welle rast e seyda, xêr e an guneh e?

Mela got heyra ne xêr e ne guneh e, qijik e ji xwe ra kiriye qijtinê ewqas.

Deka rabin destê hevdu bigrin, hevdu helal bikin, em bira ne jibîr nekin.

Gundî lihevdu hatin, gotin welle mela rast dibêje ma ne eyb e em hevdu xirav bikin?

Qiyamet heya heftekî radibe.

Li bajarokekî me, qeymeqam, serokê Şaredariyê û miftî diçin îznê. Her yek ji wan ji xwe ra wekîlek tayîn dike. Muftîjî îmamê mizgeftê dike wekîl.

Piştî çend roja Îmam jî mazeretek wî dertê, ew jî muezzinê xwe dike wekîl û diçe.

Cara yekem e ku muezzin dertê ser kursî waez bide.

Behsa qiyametê dike qaşo wê bêje "elametê qiyametê hemî derketine wê di demek nêzik da qiyametê rabe" lê xwe şaş dike dibê "ji vira û heftekê wê qiyamet rabe."

Ev gotin dikeve devê herkesî heya ku Qeymeqam û serokê şaredariyê û muftî ji îznê tên.

Esîl û wekîl hemî dicivin û gazî muezzin dikin, dibên te gotiye heya heftekê qiyametê rabe, lê va bû sê hefte qiyamet ranebû, gelo te xwe şaş kir?

Muezzin dibê belê min xwe şaşkir, gerek min bigota va heftekî ye qiyamet rabûye, min got wê heya heftekî rabe!

Gotin çawa?

Muezzin got : Roja ku hun her sê çûn û we van her sê kesên han kirin wekîl, wê rojê qiyameta bajaroka me rabûbû.

Hemî tev bi hevdu kenyan

Qîza Mela

Dema ez li Vartoyê Mizgefta Merkezê îmam bûm, yek ji cemaeta me bi navê Yaşo yê dîn jî hebû.

Yaşo (Xwedê rehma xwe lêke) mirovek saf bû, bê zîrar bû, herkesî jê hez dikir, alîkariya wî dikirin, jîyan wisa didomand.

Demekê muezzinê min çûbû îznê, muezzinê camiya jor dihat bal me muezzinî dikir. Keçek wî ya gihîştî û ezeb hebû.

Yaşo li ku sehkiribû nizanim, lê digot "mela qîza xwe bide min."

Mela jî dilê wî nedihîşt digot "tu kal bûyî, karê te tune, tu nikarî qîza min xwedî bikî, ez nadim te."

Yaşo ji wî ra digot mela ji min ra jî digot xoce :)

Yaşo ji min ra got "xoce ka bêje mela bila keça xwe bide min."

Min got "Mela Yaşo mirovek efendî ye, qirawêta wî heye, taxim cil lêne, ezepe, qîza xwe bidê."

Mela got "heyra Yaşo dîne ka çawa qîza xwe bidimê?"

Yaşo pirr lava mela kir. Dawî da got "mela ez k. te dixum, tu qîza xwe bide min."

Mela got lawo tu k. min bixwî ez bê wî çawa îdare bikim?

Yaşo got : Wî mela ma ez dibîm zavayê te, ezê yê xwe bidim te.

Mela pêra hêsket got pîsê heram hem qîzê hem dê dixwaze :)

Roj roja revê ye!

Hemîdo qêriya got „min di şerefa we û bavê we.. xwe bidin alî îro roj roja revê ye..“

Berî 25-30 salî sê heb dînen naskirî li Mûşê hebûn Yaşo, Taloyê Muşî û Hemîdoyê Kelereşê. Kelereş gundekî girêdayê bi qeza Kopê (Bulanik) va ye.

Yaşo mirovek belengaz bû. Bi lavatî, bi rica ji xelkê alîkarî dixwest, lê Talô û Hemîdo carnan doza zorbetiye jî dikirin.

Rojekê Talo li dikanekê ye, bala xwe didê ku Hemîdo jî ket wê dikanê.

Talô dibê lawo Hemîdô, ez vay li vir im, tu biçe dikaneka din. Min ji te ra cend caran got, ciyê ez lêbim ney wir!

Hemîdô dibê na, bila xwediyê dikanê pere bide te jî û bide min jî.

Talo dibê nabe em du heb ji dikanekê pera bistînin. Wesselam gelece di navbera wan de mezin dibe û herduk lihev dixin.

Talo yekî gir, bigor Hemîdo ciwan û bi quwet bû, lê Hemîdo hindek kal bûbû û wek Talo liser xwe nebû.

Dema lihev dixin zor bi Hemîdo dikeve û direve. Ji sûka nava Muşê berê xwe berjêr ber bi îstasyonê va dike û direve. Xelk xwe didin alî li wan temaşe dikin. Hemîdo diqêre dibê xwe bidin alî ji ser rêya min Talô xwe neghîne min. Talo jî diqêre dibê law nereve îro Mûş an ji min re an ji te re.

Yekî Kopî deng li Hemîdo dike dibê:

„Law Hemîdo nereve, te me li hember Muşîyan rezîl kir, law nereve roj roja şerefê ye, şerefa me Kopya biparêze“ (ew camêr bi henek ser Hemîdo de diçe)

Hemîdo jî diqêre dibê:

Law xwe bidin alî Taloyê din li pey mine, çi şeref e çi hale, min di şerefa we û bavê we... law xwe bidin alî welle îro roj roja şerefê nîne roj roja revê ye.“

Xwedê ruhe we li ku bistîne

Melakî heval digot:

"Rojekê ez û hevaley xwe, em li Enqerê li salona hotêlekî runiştibûn. Çend mirovên din jî li wir bûn. Yek ket nava derî û ji Xwedê ra da xebera. 5-6 kesên li wir pirsîn gotin çî bû?

Got; Xwedê ruhê Misto di tuwaletê da sitendiye, serdev ketiye nava pîsî.

Îja teva bi hevdura jî Xwedê ra dane xebera. Gotin çî tunebû ku ruhê misto çîma gerek li tuwaletê bîstanda!"

Mela got ez rabûm ser xwe, min got: "Lawô ma Xwedê ruhê we li ku bistîne?"

Hun jî tuwaletê dertên diçin meyxanê.

Ji meyxanê dertê diçin biraxanê.

Ji wir dertên diçin tuwaletê.

Xwedê we li ku bibîne li wir ruhê we distîne."

Gotin, way wekîlê Xwedê li vir in û dane xebera û êrîşê me kirin.

Me lihevdu xist em tev di xwînê da man heya pîlê hatin me jî hevdu kirin.

Gelî xuşk û bira mirov li ku be ruhê mirov li wir tê sitendin. Bi dinyayê nexapin, em rojek hatin yekê jî diçin!

Rêz û silav

M.Nureddin Yekta

03.07.2019

Seidê libûçî û oda li ser çar tekera

Seidê Libûçî Ji Kurdistanê ji bajarê Mûş'ê ji gundê Xeybiya ye. Ku di demekî da libûçîtî kiribû jê re Seidê libûçî digotin. Dema min dît kalekî pîrr extiyar bû. Mirovekî pîrr zana, zîrek (zekî) û heyf bû. Lê Xwedê mala feqîriyê bişewitîne! Çi ku feqîr bû kesî guh nedida axaftinên wî.

Gelek gotinên wî yên tarîxî hebûn. Ez dixwazim carnan hinek peyvên wî ji xwendevanên hêja re binivîsînim.

Te ode xwe li ser çar tekera çêbikira!

Dema mirov karekî bike an jî tiştekî çêke, gelek mirov bi karên mirova midaxele dikin. Her kesek aqil dide mirov û rê li ber mirovan winda dikin. Ev çîroka di vî derbarî da hatiye gotin:

Bavê min ê rehmetî mirovekî xanedan bû, mêvan û misafirên me pîrr dihatin. Xaniyê me hebû, lê têra me û mêvanan nedikir. Rojekî got dilê min heye ku ez odekî mezin çêkim, him ji bo qebîla me êvar êvara werin rûnên, ji xwe re suhbet bikin, him jî dema mêvan werin rehetiya wan çêbe.

Dûvre hacetê xanî sitendin û dest bi çekirina odê kirin. Dîwar bi qasî mêtrokî rabû bu an ne, rojekî Seidê libûçî hat ser însaatê û got:

-Hecî Sadullah, Xwedê oda te xêlî bike, baş e, lê kêmasîkî wî heye!

Bavê min pirsî; "gelo kêmasî çiyê? Sêid got:

-Gerek te oda xwe li ser çar tekera (kund) çêkira heya ku xilas dibû. Piştî qedandinê, te dikaribû teker

ji binê derxista. Çimkî dema mirov xanîkî çêdike,
gelek kes aqil didin mirov. Yek tê dibê xwezî te berê
paca wîyalî da bikira, te hêdîka bi odê digirt berê pacê
wê da dikir. Yekê din tê dibêje xwezî te berê derî
wîyalî da bikira, te hêdîka bi odê digirt berê derî wê
da dikir. Bi vî awahî him wanê aqil didan te
nedixeyîdin û him jî te karê bi dilekî rehet dibir serî.

Bavê min keniya got raste Seîd, mirov nikare herkesî
razî bike.
Ew bi hevdu kenyan lê em zarok bûn, me jî li wan
guhdarî dikir.

Xwedê rehma xwe li hemî bawermenda û wan
herduyan jî bike. Amîn

Serê kerê me

Nîsana 1984'an da em 59 Mela ji Mûş û qezayê wê sirgûn kirin. Ji van Mela hevaleyê me yê gelek delal bi navê Mela Bekir hebû.

Wî jî sirgûn kiribûn.

Ji cemaeta gundê Mela Bekir, rojekê piştî nimêja esrê du heb rûsîpiyên gund pevdîçin.

Herdu jî kal in, salên wan di ser heftê ra ye.

Yek dibêje "Ataturk welî bû, bê destmêj nedigeriya, di cephê şer da melaîket dihatin alîkariya wî."

Ye din dibêje: "Ataturk kafir bû, Quran rakir, hukmê îslamê rakir û qedexa kir, bi hezaran musluman kuştin û bi darda kir, tu çawa ji kafireki wiha mezin ra dibêjî welî ye?"

Yê din dibêje "tu çawa ji welîkî ra dibêjî kafir."

Herdu radibin di nava mizgeftê da bi rûyê hevdu digirin.

Mela Bekir radibe bi rûyê herduyan digire, dibê hun berdî û duvra dibê: "Ma ez li vira serê kerê me, hun çima ji min napirsî Ataturk kafir e an welî ye, ez ji we ra bêjim."

Serişkî û hilekarî

Dibên mirovekî komînîst bi navê Evdo hebûye û digot "heke Xwedê îdara dunyayê bida destê min, minê hemî însana wek hev çêkira, wek hev jî rizqê wan bida!.. Û min li tu kesî hîle jî nedikir." Lê feqîrê min nizanîbû ku komînîstî bi serê xwe hemî hîle û xurde ye!...

Ku dema zewaca wî hat, dê û bavê wî jê re kê dîtin Evdo neeciband. Gotin:

- Kuro Evdo te digot "însan hemî wek hev in" ka tu çima tu qîzî naecibîni? Evdo got:

-Ma ev zewac e, gerek ez qîza herî delal bistînim.

Çend salan li qîza geriyan û dûv re jê re yek dîtin û xwestin. Demekî şûn ve Xwedê kurekî da Evdo. Der û cînara çî nav lê danî Evdo qebûl nekir. Evdo got:

"Gerek ez navê yekê wisan lê bikim ku bi tu awahî heta niha kesî lê rexne nekiribe.

Axê gund jê ra got; "Evdo navê min li kurê xwe ke", Evdo got na "tu mirovekî bê edalet î, tu feodal î, kesên ku ji te re riyakarî bikin tu ji wan hez dikî, kesên ku serî li ber te bilind kin tu wan dipelçiqîni. Ez navê te lê nakim."

Melê gund got; "Evdo navê min lê ke, bila bibe xwendevan û ji gelê xwe ra xizmetê bike." Evdo got; "na mela tu adil nîni, kî pîrr zekatê bide te tu ji wan hez dikî lê te rojekî li feqîrên gund silavekî nekir, ez navê te lê danayim"!

Şêx got; "kuro Evdo navê min lê ke, lawo ez mirovekî welî me, herdû dunya li ba min yek in, bila kurê te bibe xwediyê keşf û keramet",

Evdo got; "Na Şêx, tu merivekî adil nîni, kî dest û lingê maç ke, cêba te tije ke, tu mifta cennetê didî wan, kesên wisa neke tu wan dişîni cehnimê.

Evdo ji kurê xwe re tu navekî nedît û got ezê serê xwe hilînim, biçim bigerim, heta ku min yekî baş dît û

navê wî li kurê xwe bikim!

Ket rê û çû, li serê çiyakî dengekî hat Evdo, got:

"Evdo ez melekê Xweda me, Xwedê dibê min kurekî daye Evdo, ezê navekî li kurê wî kim bila Evdo qebûl bike!" Evdo got; "na wellahî, ew navê ku Xwedê li kurê min bike, ez ji xwe wî navî qet qebûl nakim, Xwedê hemî insanan wek hev çênekiriye, hinek, sipî nin, hinek, reş in, hinek maldar û hinek ji birçîna dimirin, gelo va edalete? Na ez qebûl nakim!...

Evdo meşiya çû, demek şûn ve merivekî derket pêjberî Evdo û got; "Evdo ez Ezraîl im, were ez navê kurê te deynim". Evdo hinek fikirî û got; "ez qebûl dikim tu yekî bi edaletî, feqîran, maldaran, bendeyan, axayan hemî dikujî, ji te re hemî insan wek hev in, mêjyê me wek hev in, ka bêje ez navê kurê xwe deynim çi"? Ezraîl got: "Navê wî deyne Ezraîl." Evdo got "baş e" û sipasiya xwe ji Ezraîl ra pêşkêş kir û şûn ve zivirî. Evdo hê-j çend gav navêtibû, Ezraîl gazî kir: -Kuro Evdo tu merivekî feqîr î, were ez dermanekî bidim te, pê bibe doxtor. Herçî kesên ku nexweş bin, tu ji vî dermanî dilopekî bi wî bidî vexwarin, ew di cîh da baş dibe. Bi vî awahî tu hem dewlemend dibî, hem jî nav û dengê te li hemî cîhanê belav dibe. Lê bi şertê tu ji herkesî ra wek hev bî, hîle û xurda nekî. Dema tu çûy ser nexweşekî, ger ez li wir nebim, derman bidê û heqê xwe bistîne û biçê. Dema ku ez li wir bim û li ber serê nexweş nebim, tu dîsa dikarî derman bidî, lê dema ku ez li ber serê nexweş rûniştî bim tu bizanî ku ez ruhê wî distînim, tu nêzîkî wî nexweşî nebî û tu vî peymanî min û xwe ji kesî ra nebêjî ha!"

Evdo got; "ya Ezraîl ma tu duzanî ez mirovekî komînîst im û xweyê edaletê me, ji herkesî ra wek hev muamelê dikim". Ezraîl got "baş e", derman da Evdo û ji hev xatir xwestin....

Di demekî hindik da nav û dengê Evdo li cîhanê belav

bû. Evdo çû ser kîjan nexweşî, dît Ezrail ne li wir e, an jî li ber serî nîne, Evdo derman da nexwş û nexweş di cîh da rabu ser lingan.

Padîşahê wê herêmê kurek wî hebûye û nexweş ketiyê. Hemî doxtor û tebîbê wê herêmê ji kurê paşê ra tu çare nedîtine. Padîşah dişîne pey Evdo û jê rica dike ku kurê wî sax ke. Dema Evdo diçe mala paşê, dibîne ku Ezrail li ber serê nexweş rûniştiye. Qêrîn bi Evdo dikeve û dibêje, "na, welleh na, ez vî nexweşî nikarim sax kim va karê min nîne".

Paşê pîrr lava Evdo dike lê fêde nake. Paşê dibêje; "Evdo tu kurê min sax kî, ezê malê xwe hemî bidim te, te bikim paşa û ez bi xwe jî bibim xizmetkarê te". Ev gotin xweşî Evdo hat lê Ezraîl li ber serî rûniştiye, ka Evdo ê reben çi bike? Gazî paşê kir bir derva, ji paşê ra got "tu ji min ra hacetekî wisan çêkî ku mirov destê xwe bidê di yek anekî da li dor hev bizvire". Paşa hacetekî wisan da çêkirin, nexweş danîn ser hacetê, Ezraîl li ber serê rûnuştiye, Evdo destê xwe da ser bişkoka hacetê, hacet di anekî da zivirî, serê hat ber Evdo, ling çûn ba Ezraîl, heta Ezraîl ji cîhê xwe rabû, Evdo derman kir devê nexweş û nexweş di cîh da rabû ser xwe. Ezraîl awirekî da Evdo û bi derî va derket çû.

Evdo bû paşa, li ser tex rûnişt lê bi dilê kul. Lehzekî şûn ve Evdo derket derva çi bibîne? Ezraîl li ber derî li benda Evdo sekiniye. Evdo pirsî:

-Ya Ezraîl ma te xêr e?.. Ezraîl got:

-Evdo di navbera me da peymanek hebû, gerek te hîle û xurde nekira!..

-Evdo got tu bi qedrê Xwedê û Qur'anê bikî tu ruhê min bibexşînî!.. Ezraîl serê xwe hejand:

-Evdo ka te digot ez merivekî komînîst im, rast im,

durust im. Te edaleta Xwedê jî baş nedidît, ev çi lavakirina bi navê Xwedê û Qur'anê ye?...

Evdo serê xwe berjêr kir got:

-Erê dema tirs û menfeet hebe komînîst jî hîle û xurda dikin. Ezrail got:

-Evdo! Dawiya hîle û xurda pûç e, ezê jî li te hîlekî bikim, îro di şûna kurê paşê da ezê ruhê te bistînim....

Seyda û şansê xwe ma carek

Li gundeki Serhedê Seydakî me yê pirr naskirî hebû.
Di gund da malbateka xanedan hebû, lê xanima
mezin nimêj nedikir.

Temenê pîra me diser heftê ra bû.

Rojek camêr gazî seyda kir bir malê. Gote seyda "tu
xêra xwe hinek li xanima min nesîhet bike, belku dest
bi nimêjê bike."

Hemî malbat li dor seyda civiyan, seyda dest avêt
nesîheta.

Pîra me got "seyda ez nikarim destên xwe bidim xwe
û bikim nava hevîr."

Seyda got "heyra sê bûkê te hene, bila nan û hevîr
ewana bikin."

Wesselam pîrê tu rê nedit, mecbûr bû qebûl kir. Got:
"Baş e, ez êdî karê malê nakim, bila hemî bûk bikin
ezê jî dest bavêim îbadetê."

Roja din serê sibê pîra me misîn girt derket derva
destmêj bigire.

Piştî taretê ji dûrva av havêt xwe, avê ciyê xwe nedit.
Cara duduya dîsa ceriband, lê avê dîsa ciyê xwe
nedit.

Pîrê hêrket û got "Seyda û şansê xwe ma carek, ger
bû ezê taret û desmêj bigrim, ger nebe ezê dev jê
berdim."

Cara sisiya jî avê havêt xwe, avê ciye xwe nedit. Got
"Seyda qisûrê nenhêre, welle ne desmêj digrim û ne
jî nimêj dikim."

Sitrana dirêj

Kurdekî me yê nehs bi navê Evdo rojekê ji gundê xwe berê xwe dide bajêr û bi rê dikeve.

Lehzek din dibîne ku camêrek xerîb derket hember wî.

Piştî selam kelmê camêr dibê "ez şeytan im, heya bajêr diçim, tu kuva diçî?"

Evdo dibê "ez jî diçim bajêr."

Demek bi hevra dimeşin, lê şeytan dixwazê Evdo bixapîne û dibê:

"Birê Evdo bajêr deh km.dûr e, were em bazarekê bikin, em carê yek li pišta yê din sarbe sitranekê bêje, ku sitrana wî qediya bila ew peya be, yê din sarbe, ku sitrana wî jî qediya dora yê din heya bajêr." Armanca şeytan li pišta Evdo sar be heya bajêr.

Evdo got "baş e birê şeytan, min qebûl kir.

Şeytan got pêşî dora kê?"

Evdo got "dora min" û li pišta şeytan sarbû.

Evdo dest bi sitrana xwe kir "**lêlêlêlêlê lêlêlêlê lêlêlêlêlê lêlêlêlêlê lêlêlêlêlê**" heya ku çûn bajêr.

Şeytan got "birê Evdo sitrana te çi dirêj bû?"

Evdo got "birê şeytan vava "lêlêlêlê bû, hêj lolo ji para maye!

Sofîti û murîdtî! (Pêkenî û dersek jê)

Sofîti exlaqek gelek xirav e, lewra sofî bi mêjoyê xwe nafikire. Heya mirov dikarê bêje mêjoyê wan jî tune. Bi mêjoyê şeyx, rêber, berpirsiyar an jî serokên xwe difikirin. Bi vê minasebetê jî pirr caran dikevin xeterê, şaşîtiya olî an jî ya siyasî!

Sofî ji xwe bêtir tu fikir, raman, mezheb, terîqet, ol an jî rêxistinek siyasî, olî, qebûl nakin. Herkesên din, an kafir dibînin an xaîn dibînin an cahil dibînin.

Mirov ji Pêxember jî hezdike, lê dema tu sifetek Xwedê bidî Peyxember tu dibî muşrik! An jî tu sifetê Xwedê bidî şeyx, serok, rêber an berpirsiyarên cemaetên olî an jî yên siyasî dîsa mirov dibe muşrik! Wekî mirov bêje şeyxê min ji xeybê dizane, an jî şeyxê min mirova efû dike dişîne cennetê, an mirov bêje gotina serokê min wek ya pêxember e, wek ya Xwedê ye! Kesên wisan dibêjin rojê pênc hezar carî nimêj bikin jî, ew mirovana muşrik in!

Wek mînak pêkenîkî

Li bajarekî me, êvara îniyê Mela sohbet dikir û behsa Hz. Muhammed dikir.

Muhammed wiha kir, Muhammed ewqas mezin bû felan û filan.

Du heb sofîya devê xwe dan berhevdu, yekî got welle çawa ku seyda dibêje Muhammed mirovek gelek mezin bûye lê mixabin xwezî biketa terîqeta şeyxê me, bi pêşa wî bigirta, şeyxê mi jê ra şefaet bikira, ka li wê dunyayê wê halî wî çawa be!

Sitûna Tirafoyê

Li gundên Kurdistanê sitûnên elektrîkê hemî ji dara ne, lê ya ku tirafo li ser e, ew tenê ji hesin e.

Yekî me yê serhedî ji welêt tê Parîsê. Telefonê gundiyê xwe dike, dibêje "ez vay hatim parîsê lê ez nizanim bi xwe werim mala we, ji kerema xwe ra werin min bibin."

Xwediya malê dibê baş e, ka ciyê tu lê sekiniyî ji me ra bêje, emê heman werin te bînin.

Camêrê misafir dibê: "**Ez vay li ber sitûna Trafoyê sekinîme.**"

Şawqe an fotêr?

Ez demekê li bajarekî Kurdistanê Mela bûm, li wî bajarî mirovek bi nave M.A. hebû û muslimanekî modernê kevnekemalîst bû. Tim fotêr dida serê xwe, qirawata wî jî kêm nedibû.

Van salên dawîn ku nexwe bûbû musliman çend pirtûkên hedîsan stendibû dixwend û heroj dibû bela sere me, bi mere diket niqaşê. Niqaşa herî mezin ew bû ku digot "fotêr ji şawqe baştir e, çiku fotêr liserê wî bû." Her çiqas me digot herdu jî ne kincên îslamî ne û ferqa wan tune ye jî, lê îqna kirina wî gelek zehmet bû.

Rojek Şeyx Mehmed Emîn Bîngol (rehma Xwedê lê be) hat wî bajarî, me nimêja nivro di mizgefta me de kir û min ev mesela şawqe û fôtêr jê pirsî, min go belku bi esprîkî bersiva M.A. bide û em jê xilas bîn.

Min pirsî **"Seyda ma şawqe başe an fotêr?"**

Şeyx li cavên min nêhêrî, zanibû va pirsî ne ya min e lê xwediyê pirsê jî amade ye. Şeyx wiha bersiv da: „Fotêr û şawqe herdu jî libasa kafira ye û bi destê kemo hatiye welatê me, ger hun ferqa navbera wan dipirsîn; şawqe bi alîkî serê mirov de, fotêr bi herçar aliyên de dirrî, de îja ki çi dide serê xwe ew dizane.“

Hin kes ji me kurda hene dixwazin me bikin kemalîst. Camêrekî ez pir aciz kirim û got ka tu tarif bike. Min got: Kemalîzma tirka şawqe ye, ya kurdan jî fotêr e, îja hun kîjanî didin serê xwe hun dizanîn.“

Şêr û rûvî

Şêrekî birçî rastî roviyekî zeifok hat. Di nava wan da sohbetek wiha çêbû.

Şêr: Rovî?

Rovî: Lebê ezbenî

Şêr: Bi Xwedê tu çiqas melaqiya bikî, ji minre ne xem e, ez birçî me, min nêçîr nekiriye ez ê te bixwim, vêce daxwaziya teya dawî çiyê bêje .

Rovî: Eman yeman em ji bav û kalan da dostê hev in were dostiya me xirav neke!

Şêr: Ez nizanim ez birçî me, divê ez te bixum

Rovî: Nexwe bihêle ez têr bigrîm paşê.

Şêr: Bila, fermo têr bigrî, lê bi Xwedê ezê te bixwim vêca têr bigrî .

Rovî ji xwe ra têr giriya û paşê gote şêr "êdî tu dikarê min bixwî"

Şêr: Divê tu bêjî ji ber çi tu giriya?

Rovî: Weleh rehmetî bavê te hat bîra min loma ez giriyam.

Şêr: Êêêê ma çi bûye, qey ez ne kurê wî me?

Rovî: Nexêr tu kurê wî ba, tuyê bişibîha wî!

Şêr: Çawa yanî?

Rovî: Rehmetî dema xwe ji hev vedikişand û xwe diqevast, xwe di ser vê newala kûr ra davêt, careka din dîsa dihat nêçîra xwe dixwar, hima tu nikarî!

Şêr rabû xwe ji hev vekişand got "ez di şibihime bavê xwe an na?"

Rovî: Weleh biçekî bi serde diçê, lê şert newal e,
Carekê şêr hatê xazê, bezî bezî xwe di ser newalê re
avêt, xilas nekir, kete xwarê wê newala gelkî kûr,
pişta wî şikest!

Rûvî çû serê lê nihêrî, tiliya xwe bi ser de hejand got:
Bi Xwedê bavê te jî eyn sekî wekî tebû

Tira Fatê û k. Misto (Ji qissê hisse)

Rojek ji roja Paşa û wezîrê xwe derdikevin nêçîrê. Ta êvarê digerin tu nêçîrek nabînin. Dema dibe êvar di nava daristanê da rastî malekê tîn. Paşa ji wezîrê xwe ra dibêje; „Em îşev li vira bibin mêvan, ka ev mala bi tenê li vir çî dike hale wan çiyê?”

Dema diçin ber malê, mêrik û jina xwe li ber derî ne. Li wan silav dikin û dibêjin; „em rêwî ne, li der mane ku mimkin be îşev bibin mêvanê we.”

Camêr dibê „ser çavan fermo werin mal.”

Dema diçin hundir, mêrik dibê „eva ez Misto vava jî jina min Fatê.”

Paşa jî navek sexte li xwe û wezîrê xwe dike, wisan xwe didin nasîn.

Fatê ji wan ra hinek dew û mast amade dike, sere du hêka li hev dixê dide ber wan.

Piştî nanxwarinê demek diçe, Fatê ji nişkava tirek dike. Misto dipirse “Fatê tira te dibê çî?

Fatê dibê “Misto tira min dibê vana ne rêwiyên normal in, yek ji vana paşa ye yek jî wezîrê wî ye.”

Paşa û wezîr şaş dimînin li çavên hevdu dinhêrin.

Misto dibê; „Fatê ferq nake mêvan mêvan e, ser çava. Bila îşev li vir mêvanê me bin sibê oxira wan ya xêrê be.”

Piştî demekê Fatê dibê „Misto gelo dema razanê hat, ez çiyê amadekim bila mêvan razên an ne?”

Misto aletê xwe derdixê, lê dinhêre, sere wî wê da virda diqelibîne, dibê „Fatê saet tam deh (22:00) dem hatiye çiyê deyne.”

Paşa ji wezîr ra dibê; "ka bi dizî li saetê binhêre saet çîye?"

Wezîr xwe arxayîn dike, dinhêre belê saet tam dehê şevê.

Di ber xwe da dibê „paşa yê min saet deh!.”

Paşa dibê „lawo wezîr rabe ku arif TIRA Fatê be, dem û zeman saet jî k. Misto be, halê me xirav e sibe li me nay!”

Vaya min li ser çî got:

Heya serokê me ji me nebin, heya rêber û zanyarên me ji me nebin, tirk û faris û ereb ji me ra pêşkêşiyê bikin, bibin serok û rêber, hale me xirav e û siba me jî nay!

Şikir nakim!

Dema ez li Vartoyê îmam bûm, ji cemaeta min yê daîmî yek jî Nizameddin Beg bû. Nizameddîn Beg kurê Ehmed Begê birayê Xalid Begê Cibirî bû.

Nizameddin Beg mirovek bi şexsê xwe û aboriya xwe feqîr bû, lê mirovek rast û gelek maqûl bû.

Rojekê zutirîn hat mizgeftê, ez jî li wir bûm, me li halê hevdu pîrsî. Min got. Beg tu cawayi? Got ez rast bêjim an derewa bikim. Min got rast bêje, haşa jixwe derew ji te nayn.

Got welle ez nebaş im. Min got şikrê Xwedê ke belku baştir bibî.

Li çavên min nêhêrî got Mela Nuredîn ez rast bêjim an derewa bikim?

Min got estexfirullah Beg, fermo ya dilê xwe bêje.

Got welle ez şikir nakim. Min got çima? Got:

- Ka ezê ji çi re şikur bikim? Ez yekî zeîf, nexweş, feqîr û perişan im, malê min tune, ez bixwe nexweş extiyar im, jina min nexweş e, diranê min ketine, perê min tune, ma çi heye heya ez çi ra şikur bikim. Rasti ez gelek keniyam û ew jî keniya.

Middek di pey vî re, rojekê Şeyx Mehmed Emin, Mela Sidîq, Mela Ebdurrehman, Mela Qasim, Mela Ebdulmecid em bihev re li nava sûka Vartoyê digeriyan. Mela Sidîq got wele em westiyan ka em biçin mizgefta Mela Nureddin bila ji me re hinek mêva bîne em bixûn.

Şeyx Mehmed Emîn got baş e, de biçe ji me re hinek sêv û hurmiyan bikire.

Min çend kilo sêv û hurmê sitendin, em hatin derê mizgeftê. Liber derê mizgeftê eywanek hebû. Dem havîn bû, me xwe da bersiya eywanê. Ji xwe wir ciyê desmêj girtinê bû jî.

Min got ka ez vana bişom paşê em bixun, lê mixabin kêra me jî tunebû. Şeyx keniya got „heyra icabê şuştin û kêrê nake. Hima çakêtê xwe bilindkir û sêva xwe bi astarê wî paqij kir û da ber geza. Em hemî liser piyan bûn. Dem piştî nivro nêzîkî nimêja esrê bû.

Dema me sêv dixwarin û Şeyx henek fikir, me dît ku Nizamedin Beg hat cem me. Çawa dît ku em tev li piya seva dixûn got:

-Wey hun hemî şeyx û mela rabûne ser xwe û mêva dixun?

Şeyx keniya got "Beg ma em rabin ser kê sêva bixun" Em wisan kenyan perçê sêva di pozê me re davêt. Min cara nedîtibû ku Şeyx henekên wisa bike, lê him em heval bûn û hem jî dostiya wî bi malbata Nîzamedin Beg re hebû, ez bawer im loma karî ev heneka bike.

Şeyx Mehmed Emin di sala 1993 de, di bin çav de hate şehîd kirin. cenazê wî li nêzîkî Qijiltaxê li ber rê hate dîtin. Xwedê hezar rehma xwe lê ke.

Şivan û bêrivanên me neman !

Di sala 1992 an da ji Serhedê Melakî Kurd diçe paytexta tirka Enqerê. Diçe ku bi kurdek burokrat ra hevdîtînê çêke.

Beriya ku birêkeve ew kurdê burokrat ji mela re têt dike û dibê;

-Seydayê heja, ji kerem xwe re ku tu hatî Enqerê ji min ra du devo penêr, du post toraq û deh kilo çortan bixwe re bîne!..

Mela dibêje başe keko ser çava, ka ez lê bigerim ku bibînim ezê ji te re bînim.

Dema mela diçe Enqerê û bi wî dostê xwe re hevdîtînê dike, kurdê birokrat dipirse

-Ka te ji min re çi anî?

Mela dibêje:

-Bira li qusûra min nenhêre, weleh ez li hemî ciyan geriyam, partiyên kurda gundê xwe vala kiribûn û hemi şivan, gavan û bêrivanên me bûbûn siyasetmedar, jiber vî kesên ku penêr, toraq û çortan çêbikirina nemabûn, loma min nanî.

Tirrên ber mirinê (Ji qissê hisse)

Dibên mirovek bi navê Evdo hebû nexweşketibû di nav ciyanda bû. Rojbiroj xirav dibû.

Rojek hat û êdî omîd jê hat birrîn. Zikê wî sancû dikir û ba berdiket. Derdor û cinar ji bonê dihatin lê dema didîtin ku xalê Evdo tirra dike, diber xwe da dikeniyana lêva xwe dişkênandin.

Rojekê kurek wî got: „Bavo tu dimirî û em dimînin, sibê ku em û ciranên xwe berê xwe bidin hevdu, wê bêjin lawo min di gorra bavê..... Bavê we di ber nez'aruh da tirri tirra qûna wî bû... Heyra hay ji qûna xwe hebe, me rezîl û rusway neke.”

Evdo got: **“Kurê min, ez vay dimirim û diçim, carek din jî nazvirim nava we û em li çavên hevdu nanhêrin. Heya tirre min hebîn ezê bikim û dûvra biçim de îja gorra bavê we û cinar û gundiyan hun çawa dikin hun dizanin.”**

Va qissa bona kesên ku çî tê devê wan dibêjin, çî tiştên nebaş hebin dikin û qet jî li derdora xwe nanhêrin, hezra kesî nakin, tê gotin.

An jî dema serbest bin xwe pirr mêrxas dizanin, dema dikevin tengasiyê xwe û welatê xwe û mirovên xwe û doza xwe difroşin.

Xalê rêxo

Xalê Şêxo gavanê gund bû. Rojek li ber dewara li tûmekî rûniştî bû. Xortekî hat silav dayê.

Piştî merhebatiyê xort got:

- Xalo navê te bixêr?

Xalo got navê min Şêxo.

Xort got ser çava. Demek şûnva berê xwe da xalo:

- Xalo titûna te heye, tu bi qasî cixarekê bidî min.

Xalo derxist hinek titûn dayê.

Xort got xalo welle ka xêra xwe kaxizekê jî bide.

Xalo kaxiz jî daye.

Xort cixara xwe pêça, danî devê xwe, got xalo ka agirê xwe jî, ji kerema xwe.

Xalo agir dayê cixara xwe jî pêxist. Dûvra got xalo ev kampaxa ku ez hînê wê bûme nikarim terka wê bikim.

Xalo got "**berxê min, kaxiz ji kîsê xelkê, titûn ji kîsê xelkê û agir ji kîsê xelkê, ez bim jî ez nikarim terka cixarê bikim.**"

Lehzek din xort berê xwe da xalo got: "Xalê Rêxo navê bavê te çi bû?"

Xalo got: "**Tew te navê min safî kir ma dora navê bavê min!**"

Xalisê Bayburdî

Xalisê Bayburdî, ji Stenbolê diçû Erzirimê. Bilêta posta tirenî girtibû lê sarê Expressê bûbû. Di rê da dema memûrê trenê bilêt kontrol dikir di navbera wan da wiha sohbetek çêbû.

Memûr: Xalo tu şaş sarê Expressê bûyî.

Xalis: Çima lawo ma va jî tren e ew jî tren e!

Memûr: Xalo wiha nabe, herdu jî tren in lê ne wek hevdu ne.

Xalis: Lê em çawa bikin?

Memûr: An ferqa bilêta wê bide, Express biha ye, an peya be, sarê Postê be.

Xalis: Ew ne karê min e, karê makînîst e! Zû an dereng dajo. Ez zêde pera nadim.

Memûr: Xalo va Ekres e, vava zû diçe, posta dereng! Peyabe sarê postê be, hêdî hêdî biçe Erzurimê

Xalis: Welle ecela min tune, here ji makinîst ra bêje bila hêdî hêdî bajo wekî postê, ez ecele nakim!

Xenîmî çavên we be!

Li gundekî çiyê gerîlla tim diçin malekê. Xwediyê malê Xalê Evdo kalekî kurd e, hay ji bavê felekê nîne.

Rojekê dîsa du gerîlla li mala wî ne, leşkerên tirko dor li malê digrin. Herdu gerîlla bi tev Evdo ve digrin dibin qereqolê. Dema birê de diçin yek ji gerîlla dibê;

-“Apo wê niha îfadê me bigrin, aha jibîr neke, “ne tu me nasdikî ne jî em te nasdikin.”

Cendirmê tirkan xwe hêrs dikin dibên susun konuşmayin (hiş bin, neaxivin). Nahêlin ku zarok apê Evdo serwext bikin.

Dema dertên mehkemê herdu gerîlla dibên “em vî camêrî nasnakin, me dît leşker ketin nava gund, me jî xwe avêt mala wî, tew ew hay ji me tunebû.” (*)

Hakim dizvire ji Evdo dipirse, vana nasdike an ne! Evdo xwe gelek aciz dike, dibê:

-“Hakim beg ka ez çî bêjim, vana him nankor in, him jî derewîn in, welle cezayê vana du qat bidê. Vana di rojên rehet de, heroj di mala min de bûn, îro jî ketine tengasiyê dibên tew em nasnakin.”

Dizvire ser herdu gerîlla:

-“Law xenîmî çavên we be, we hindik nanê min xwar û hun îro jî înkâr dikin!

Xiyarê me meşhûr in!

Dema li Muşê rêya hesin çêdikin, herkes mereq dike gelo ev rê çiyê û çawa çêdibe! Ji ber vê jî gelek mirov ji gundê xwe biredikevin û diçin Muşê.

Yek ji van mirovan jî Seîdê libûçî ye. Her wekî ku xwendevanên hêja jî dizanin ku wê demê kesî bi zimanê tirkî ewqas nizanî bû, lê xalê Seîd hinek dizane.

Dema Xalê Seîd diçe bal karkirên rê, şefê rê bi tevî karkiran va dixwazin bi kâlekî kurda henekê xwe bikin. Şef dibêje

- Xalo piştî ku me karê xwe xilas kir, ez dixwazim ji welatê we tiştêki bi xwe re bivim, bila bive hediya we, tu çî tewsiye dikî?

Xalê Seîd pêşî qenc difikire û dibêje:

-Birarzî, her tiştên welatê me qenc in, tu çî jî bivî poşman nabî!

Şef bi ken dibêje:

- Na xalo dibên ku firingiyê we yê sor pirr xweş in, ez dixwazim ji wan hinekî bivim ku milletê min jê bixwe û tamê jê bibîne!

Xalê Seîd fêhm dike ku ev teresa bi mane tiştên nexweş ji welatê me ra dibêje. Berê xwe dide şef û bersiv dide:

- Na lawo! Tu şaş î, xiyarê welatê me pirr meşhûr in, barekî xiyar bi xwe re bive, hem bixwun û hem jî toximê wî bireşînin bila welatê we pê şên bibe!

Yê navîn ez im Bubaaaa

Ji Anataoliya Rojava efekî ji malbateka feqîr çûbû
esker, beriya eskeriyê xortek zêfê (jar) zirav bû.
Dema çû esker wî kirin feraqşoyê aşxanê.
Di aşxanê de him firaq dişûşt, wan der û dora paqij
dikir, him jî dilê wi çî bixwesta ji xwe ra dipijand û
dixwar. Bi vî awahî di demek kurt de xwirt bû, bû wek
canegakî.

Rojek xwest ji malbata xwe re wênek bişîne ku bibe
xatira leşkeriyê.

Di liqa eskeriyê de kerek û kûçikek jî hebû.
Dema wêne kişand yekî da aliyê xwe yê rastê û yekî
jî da aliyê çepê, her wiha wênek kişand û ji malbata
xwe re şand.

Li piştta wene jî wiha nivîsî ji bavê xwe re:
"Bûbaaa (bavoo) piştî ez hatim eskeriyê pîrr hatim
guhertin û niha gelek qelew bûme qet naym naskirin.
Vayê ji we ra wênek xwe dişînim, lê bi diqet binhêrin
di wêne de 3 kes hene, yê ortê ez im ka bala xwe
bidinê hun min nasdikin an ne?

Zebanî çawa ne?

Li Mersînê malbatek xinamiyê xalê min hebû. Qîza xalê min bûka wan bû. Xwedê rehma xwe lê ke, bi ciwanî qansêr bû û mir, temenê wê 28 salî bû. Çi ku malbata wê dût bû, êdî lê xwedî derketin bûbû wezîfa min. Wek xuşkek xwe ya biçûk hima her hefte rojek diçûm min serê lê dida, pirsas halê wê dikir, bo xatirê dayika xwe û xalê xwe. Kurek wê hebû wan dema 4-5 salî bû. Ji min gelek hez dikir.

Rojekê ez dîsa li mala wan bûm, malbata wan tev liserhev bûn. Xesî, xezûr, tî, baltûz û hinek jî cîran. Lawkê wê hat himêza min û got xalo "Zebanî çawa ne"? Ez şaş mam ji pirsas wî. Ev zaroka li ku navê zebaniyan sehkirîye!

Min got berxê min zebanî melaîketên Xweda ne, dergevanên cehnîmê ne, pirrî sert in, bi heybet in, bi xof in loma ji wan re dibênin zebanî! Lê zarokê reben ji bersiva min fêhm nekir. Dîsa pirsî!

Xalo ma jin in an mêr in, çavên wan hene, devên wan hene?.....

Min dît ku ez û xwarziyê xwe em hevdu serwext nakin. Ez fikirîm ka vî zarokî çawa bidim sekinandin. Min liderdorê xwe nihêrî û min bang li meta wî ya mezin kir.

Xuşka X... Ji kerema xwe re dikarî rabî ser xwe? Canîkê rabû piya. Min got 'ji kerema xwe re ka were orta odê.'
Canîkê min neşkênand rabû hat orta odê, sekinî û li çavên min nêhêrî ka ezê jê re çî bêjim. Wê zenkir ku ezê an iskanek çay an av bixwazim.

Min serê xwarziyê xwe zivirand berê wî da meta wî.
Min got 'berxê min ka baş li meta xwe binhêre,
zebaniyê cehnimê hemî eynî wek meta te ne"..

Piştî vê gotinê pirqîn bi cemaetê ket û gellek kenyan.
Meta wî jî pirr kenya û got "wî seyda tu xwedê te qet
mînakek nedît ez kirim zebanî.

Min got "xuşka min welle îmkana xwarziyê min fêm
kiriba tunebû, lê niha binhêre ka êdî deng dike. Him
zebanî melek in, min tu kirî melek"

Lawik zûr bûbû li meta xwe dinhêrî, kifş bû ku wî
dixwest zebanî baş naskira.

Zewac

Di dadgehê de dadger ji Çeto pirsî:

-Tu bi kê re zewicî yî?

Çeto:

-Ez bi jina xwe re zewicî me

Dadger hêrs bû:

-Ma te dîtiye hinek bi mêran re zewciye?

Çeto:

-Belê min dîtiye, çawa nedîtiye?

Dadger:

-Kî?

Çeto:

-Jina min

Zikrê roja Îniyê

Hecî Ebasê Derikî digot rojekê cîranekî me got her êvarê Îniya gundî li mizgefta me dicivin û zikir dikin, haya tê jê heye?

Min got na ez hay jê nînim, ka em jî vê Îniya biçin tev wan zikir bikin.

Wê Îniyê em bi havdu ra çûn mizgefê. Me dît ku gundî tev di cezba da ne, kes hay ji xwe tune. Hevalê min got Heci vana ewqas diricifin gelo em cima naricifin?

Min got herhal em nû ne loma, em jî çend caran werin, emê bikevin hewa cezba.

Min dît ku Heciyê cîran X. li ber sitûnek sekiniye serê xwe li sitûnê dixê û dibêje Allah Allah Allah

Min got ka em viya biceribînin, bi rastî di cezba da ye an hemî riyakarî dikin.

Heci X. mirovek pirr tima bû.

Me pilanek çêkir, hevalê min li alîkî, ez li alîkî Hecî X. sekinîm. Hevalê min got: "Heci Ebas tu zanî muxtar salmeka nû daniye ser gundiya, ji feqîra 2.500, ji halxweşa jî 5.000, ji dewlemenda jî 7,500 dicivînin.

Min got normal e, baş e. Lê Hecî X. guhê xwe dagirt! Hevalê min got baş e, lê ya nebaş Hecî X, feqîr e hima 7.500 dane ser wî.

Hima di cîh da Hecî X. zikir danî got; ew muxtar û heyeta ku salma min 7,500 datînin ezê dê û jina wan. Me got bi xatirê we, û em derketin hew çûn zikir!

Zirara pezên sor!

Camêr hatibû gundekî, xwediye birrê pez bû.
Bala xwe dayê mêr kes naxuyên, hemî jin û zarok.
Ji yekê pirsî; gelo mêr li vî gundî tunene?
Gotin; çawa helbet mêr gelek in, lê îro iniye çûne
mizgeftê.

Mizgeft çiyê?

Gotin aha ew xaniyê mezin di nava gund da ew e!
Tam di wê anê da mela ezan da.

Camêr got va kiye dibê çî?

Gotin va mela ye ezan dide, dibê werin mizgeftê
nimêj bikin.

Camêr got nimêj çiyê, çî dikin?

Jina jê ra izah kir, lê camêr fêr nekir.

Berê xwe da jina got:

- Hun dev ji hemiyar berdin, niha ev camêrê qêreqêr
dike, zirara wî ji pezê sor ra heyê an ne?

Jina gotin na zirara wî tune.

Camêr got:

- De bila bi kêfa xwe qêreqêr bike, welle ne diçim
mizgeftê ne jî nimêj dikim!

Zirne û saz

Sal 1974 bû, mudurek ji Gumuşxanê hatibû Îmam-Xetîba Mûşê. Mudur mirovek gelek nebaş û dijminê kurda bû, bi taybet dijminê mela yê medresan bû. Boy vê jî qeyda kesî çenedikir ku ji derva bikevin îmtihana Îmam-Xetîbê.

Bi vê minasebetê hemî mela û seyda yê me diçûn bajarên derdora diketin îmtihanê.

Min jî (hêj gelek ciwan bûm) miraceet kir, lê mudir qeyda min çenekir.

Ez çûm Xarpêtê, mudur kurd bû, xwe gelek aciz kir got hun eyb nakin teresek hatiye Mûşê hun hemî feqî û mela diçin dervayê Mûşê ez qeyda te çênakim herin wî kûçikî ji wir bikin der.

Li ser tawsiya wî, min jî şikayeta mudurê Mûşê wî bi walî da kir.

Mudurê perwerdê kaxizekî jî bi arzûhala min da danî got here bila qeyda te çêke.

Ez derketim ber derî lê newêrim tenî biçim Îmam-Xetîbê.

Min dît ku pismamêki min way li salona xaniyê wîlayetê ye. Ew pismam jî ku min digot di eşîra seydan da ji bilî Seydixanê Usu ew e her mêrxasê me. Lê mixabin ew jî newêribû bi min ra bihata.

Derketim çarşiyê min bira yê min xwe girt em çûn oda mudur û min bi zor qeyda xwe çêkir.

Lê mudur pirr bi dijwarî dijminê min bû.

Dema îmtihana hat, em çûn Îmam-Xetîbê.

Wê rojê îmtihana dersa muzîkê bû. Ders ji dersa mudur bû.

Dema ez ketin hundur, serê xwe hejand got ka were tu yê çend sala biçî û bêy.

Min dengê xwe nekir.

Gelek pirs ji min kirin lê min hemiyan bersiv da.

Pirsa dawî got aletê muzîkê çend çeşît in?
Min got du çeşît (cure) ne, yê bi dest lêdixin û yê bi nefesê.
Got ka aletên bi nefesê lêdixin bijmêre.
Min got, bilûr, mey, saz (dil xwe da dibêm zirne)
Got saz bi nefesê lêdixe?
Min got belê bi nefesê lêdixe.
Got ka bêje saz çawa ye?
Min got saz wek bilûrê ye, lê serê dikeve devê mirov zirav e, serê din wek kovika ye, bi gelemperê bi defê ra tê lêxistin, çend qulê wê hene, hinek li ser in, hinek li bin.
(Du mamosta li ber masê rûniştine, bi min dikenin, dizanin ez tarîfa zirnê dikim lê devê min şaş dibêje. Ji tirsê mudur nikarin alîkariya min jî bikin)
Got navê wê saz e?
Min got belê
Got derkeve
Ez derketim.
Piştî notê me kifşe bûn, wî zalimê ji herçar kilasa jî sifir dabû min, halhale min ji deh pîrsan yek tenê bi şaşiya nav nizan bû.

Zirna min heye mela yê min!

Sal 1975 bû, demsal zivistan bû, ez ji gundê xwe diçûm Milazgirê Xirbê Quddûs Begê.

Em bi rê da pirr cemidîn, dema daketim nava bajêr çûm qehwekê, min kursîkî girt li ber sobê runiştim, garson ji min ra çaykê anî.

Lehzekî şûnva, camêrekî jî hat ber sobê rûnişt.

Piştî merhebatiyê, Pirskir tu çi dikî, min got ez feqî me. Dûvra got mela tu çaykê îkramê me nakî?

Min got ser çava. Min zenkir ji axawetên Milazgirê ye, dixwaze sohbetekê bike. Paşê jî wê perê çaya me bide.

Lehzkî şûnva du xort hatin, gotin axa ka te boy dawa me tişt negot.

Axa got: Min ji mezinên we ra got, ger hun qebûl dikin ezê werim, ku hun qebûl nakin herkes li mala xwe."

Min zenkir dawek mezin e, wek mêr kuştin, qîz revandin uwd.

Xortekî li min nihêreî got axa va jî hevalê te ye?

Axa got na ez nasnakim.

Xort çûn. Min got axa te çima ew şikênand, tê zanîn hun mirovek mezin in, daw doz bê we çênabe.

Got belê dawa bê min çênabin, defa min heye fqiye min, zirna min hey emela yê min.

Min nû fêm kir ku mirtib e, daw jî dawet e!

Hima hêdika ji kêleka wî rabûm û çûm.

ÇEND ÇÎROK

Berî û Berîvan

Bûka Nûro Axa nû hatibû. Kurê wî, dema li Stenbolê kar dikir di wê taxê da keçek dîbû. Keçik xwe tirk dihesiband lê bi eslê xwe koçer bû. Ji koçerên Boşnakan. Di dema Osmanîyan da gelek nijad tevhev bûbûn. Tîxûbên Dewleta Osmanî li ser sê qit'ên cîhanê belav bûbû. Di dema cenga cîhanê ya yekemîn de hêzên derva bi tev hevalên xwe yên hundurîn dewletê gelek biçûk kiribûn. Hêzên derva bi hevalên xwe yên hundurî va dewletek biçûk avakirin û navê wê danîn Tirkiye. Serok komarê dewlete digot ku „kesên di vê dewletê da dijîn navê hemîyan tirk e.“ Boy vê, ji bilî Kurda hemî nijadên din ji xwe ra tirk dibêjin, lê kurd hêj jî berxwe didin.

Bûk nû bû, ne tewle dîbû ne jî gom, ne pez dîbû ne jî dotin!.. Nû nû fêrî kurdî dibû. Der û cîran dihatîn bûkê didîtin û digotin „çi bûkek xweşik kurê Nurô axa ji xwe ra aniye.“

Bûkê ji urf û adetên kurda jî tişteke nizanibû. Dema hin bihatina mal mêr jin mezin biçûk bi herkesî ra diaxivî, wek adetên tirka, yanî bûktî nedikir, rebenê çi zanibû bûktî çîye? Dema sifre dihat erdê, wê beriya herkesî kevçiyê xwe digirt dihat ser sifrê.

Rojekê xesiya wê got „keça min li cem me Kurda hin adet hene, wekî bûk bi herkesî ra naaxivin, bi rûsîyan ra bûktî dikin, yanî navê neaxavtinê bûktî ye li cem me. Him jî rûyê xwe digrin wiha dev û poz

tê girtin lê çav, vekirî dimînin. Bi xortan ra jî neaxivê, an wê bêjin ku bûk bê terbiye ye"

Bûk roj bi roj fêrî adetên kurda dibû. Hin adet jê ra gelek xerîb dihatin. **Bi rastî ev adetana ji min ra jî xerîb tên. Çima gerek jin bi taybetî jî bûk bi kesî ra neaxivin, çima mecbûr in rûyê xwe bigrin, çima li ber xezûr an jî tiyê xwe nexun venexûn?**

Bihar bû, kulîlka nû vedida. Gîha hêşîn dibû, dema pez derkeve derva hatibû. Pezê Nuro Axa gelek zabû, lê hêj hinek mabûn. Bûk çûbû gomê dît ku hinek pez zane. Hat mal ji xesiya xwe ra got „**dayê hin pezên me bebek anîne**“

Xesî gelek keniya û destê xwe li nava milê bûkê xist û got „**keça min were ez hinek tiştan fêrî te bikim.**“

Em ji zarokên (bebek) ajalan ra têjik dibêjin. Hima ne ji hemiyar ra. Ji zarokên miyan ra berx, ji yê bizinar ra kêr, ji yê çelekan ra golik, ji yê madakan ra sak, ji yê hespan ra canî dibêjin, ji yê ku goştê wan naynê xwarin wekî pisîk wekî kûçik, ji yê wan ra jî têjik dibên.

Di zimanê me da zayenda mê û nêr heye. Di tirkî de ferqa jin mêr tune ye, di lêkerê (fiil) da, ne di navan da ne jî di cînavkanda (zamir).

Bo herkesek an her tişteke nav û cîvakeke heye. Wek pez du beş in. Bizinî û mêşinî. Ji nêrê biziniyan ra nêrî, ji mê yê wan ra jî bizin, ji nêrê mêşiniyan ra beran, ji mê yê wan ra jî mî tê gotin.

Bûk gelek kêfxweş bû ku fêrî çend bêje yê kurdi bûbû.

Rojekê xesiya wê got "keça min lawo îro roja **berodanê ye**"

Bûkê li çavên xesiya xwe nihêrî wekî bêje berodan çi ye? Xesî keniya got keça min tu zanî heroj pez tê mal, em an didoşin dûvre berxa berdidinê. Yanî berxên wan didin ber wan. Piştî berx mijiyên, em ji hev diqetînîn, berxvan berxa, şivan jî pez dibe çolê. Lê îro em ji hev naqetînîn, ji nivro heya êvarê berx li ber diya xwe dimînin, nave wê jî berodan e!..

Dem dibuhurî û roj bi roj bûk fêrî kurdî dibû. Bihar û rojên serma derbas bûbûn, havîn bû êdî pez nedihat hundir, derdiket şevînê. **Şevîn**; yanî pez bi şev nay mal li çolê dimîne. Nivroj û berêvara rojê du cara pez dihat bêriyê. Cara yekem bû ku jinên taxê elbê xwe hildidan û diçûn bêriyê.

Bukê ji xesiya xwe pirsî "**dayê bêrî çiyê bêrivan kî ne**"

Xesiyê got lawo keça min:

Bêrî nave çiyê ku pez tê nêzîkî gund an jî taxê, li wir mexel dibe û jin diçin li wir didoşin. Bêrivan jî ew jin an keçên ku diçin pez didoşin.

Bêja bêrî û bêrivan li cem me gelek bi rûmet e. Bêrivan eşqa şivana ne, gelek çîrokên me kurda liser bêrîvana hene. Gelek axa û begên me kurda, keçên wan dil ketine şivana û bavan nedane wan. Li ser hev har û dîn bûne, li ser hev helbest û sitran gotine, bûne wek dîrok û çîrok di nava me kurdan da!.. Gelek dengbêjan li ser bêrîvana sitran nivîsîne. Dem çiqas derbas bûbe jî, bêrî û bêrivanan çiyê xwe tim parastine.

Bêrîvana min çû bêriyê, elbê darîn di mil da
Silav neda û nenhêrî, miraz hîştî di dil da
Bi wê bejna bilind meşî, gav fireh avêt û çû
Wekî mara bi min geztî, dil ma di xem û kul da

Xezala Şengal û Cûdî, ji lêvan şekir dibarin
Hingivê şana mîsal in, di guh da zêr guhar in
Kemera zîvîn li pişt e, dil girîftdar xedar im
Herçî kesên ku wê dîtin, nexweş in birîndar in

Cendirme û Ezana Sibê

Jinan dîsa weki hercar elbên xwe dabûn destên xwe diçûn ser kaniyê. Ji xwe li gund kanîkî tenê hebû. Jinên gund li wir diketin dorê, car hebû ku saetekê dor nedihat mirov. Boy vê jî, pirr caran liser kaniyê gelek jin dicivîyan û suhbet jî dikirin. Rojek wiha dîsa jin civîyabûn û ji nişkava dengê hat, dikir qerîn û digot:

- Cendirme hatin cendirmeeeeeeee!

Dengê zarokê 8 salî bû. Lê dema bêja cendirme derbas biba hemî gund, mezin û biçûk, jin û mêr hemî ditirsiyan. Ji yê ku pir ditirsiyan yek ji wan jî Melayê gund Mela Sebxtullah bû.

Mela yekê kal bû. Dema min ew dît (1980) derdorê 80 salî bû. Wî di ciwaniya xwe da, ji destên cendirma pirr kişandibû. Dema yek partîtî bû. Wan deman bi gelemperê hemî gelên Tirkiyê, lê bi taybetî jî gelê me pirr zor û zecir, pirr heqaret û zilim dîbûn.

Wan deman her cendirmek general û her generalek jî firewnek bû. Dema cendirme diketin gundan, gund xirav bikirana kesî ji wan hesap nedipirsî. Bi xwe diketin malan, kontrol dikirin, ji xwedyê malê rişwet distendin, kêfa wan bixwesta dibirin qereqolê li wan êşkence dikirin, dûvre jî minneta xwe didan ser wan û wan azad dikirin. Ferq nedikir ku derheq wan malan da şikayet heba an tuneba! Ji xwe li welatê me, kesî nikaribû ji polêsan an ji cendirman bipirsiyan „**ka destûra we ya mal kontrolkirinê heye an ne?**” Ji xwe ev pîrsa bi tenê, dibû sedemê mehkum kirina mirovan, heta carnan dibû sedemê kuştina wan jî!.. Boy vê kesên ku ew rojana dîbûn tîrsa wan zêdetir bû. Wan ji zarokên xwe ra, zaroka jî ji torinan ra digotin. Her wiha tîrs liser herkesî dubare dibû. Loma

jî zarokan dema behsa cendirma dibihîstin wek
tellalan dikirin gazî dakû herkes hay ji xwe hebe.
Kesên çekên wan hebin çekan veşêrin, kesên qaçax
hebîn ew jî birevîn xwe xila
s kin.

Dema jinan ev deng bihîst, Zelixan zivirî ser milê xwe
yê rastî ji Fatimê pirsî:

- Erê Meta fatim, gelo cendirme îja bo çi hatin gund?
Fatimê girikên sermilên xwe wiha berjor hejand, lêva
xwe xwarkir, bê made got:
- Ez nizamim, lê dibe ku boy Mela hatibin.

Zelîxan:

- Mela?... Melayê reben, extiyar kal, ka wê bi mela çi
bikin?

Fatimê:

- Qey tu pê nehesiyayî? Wê rojê di navbera wî û Beko
da xirecir çêbûbû. Beko gotibûyê „**tu hemî gundiyan
wek hev nagirî, diçî mala hinekan û naçî ya
hinekan, tu ezanê bi erebi dixûnî ezê li cem
başçawişê qereqolê şikayeta te bikim!**“ Dibe boy
tiştêk din be, an jî dilê wan goşt xwestibe, werin biçin
malekê, xwediyê malê bitirsînin û ew jî ji wan ra
pezek serjêke û biziqimînin û bicehimin biçin.

Zelîxanê got:

- Kurrê hişbe, dibên deng diçe erdê, guhen erdê
hene, de welle cendirme vê gotina te sehkin, wê ka çi
bînin serê te.

Fatim :

- De qey ez ji kê çêtir im, wan ewqas mezin û rusipiyên
me kuştin, bila ez jî yek ji wan bim.

Cendirme ketin nava gund, çûn ber derê mizgeftê.
Mela li ber derê mizgeftê runiştibû. Kifşe wî jî dengê

tellalê biçûk sehkiribû. Şaşika xwe veşartibû, xwe serqot kiribû, serê wî yê rût ji dûrva dibiriqî.
Dema Mela çav bi cendirma ket hima rabû ser xwe, ji wan ra rêz girt. Ji xwe tişteka din jî nikaribû bikira, wî cendirma baş nasdikir.

Cendirma bi mela tinaz dikirin :

- Melê kurda, serqotî baş li te nay, kanê şawqê te?

Mela got :

- Min şawqe danîye mal, gerek xanima min bişo, belku ez van roja biçim bajêr.

Cendirme:

- An tu jî li hember şawqe disekinî?

Mela:

- Tobe haşa, heddê bavê kê ye li hember dewletê derkeve?

Cendirme:

- Mela hinek dengê nexweş ji hêla te da bal me va tê, hay ji xwe hebe, rojêk emê ser te da bigrin, êdî

Xwedayê we (we kurda yanî) jî nikaribe te xilas ke!

Mela pirr aciz bû lê nikarî deng bikira. Di dilê xwe da

got **"Xwedê xenîmî we be, bersiva we li cem min**

heyê, lê çibikim nikarim, hêviya min ji Xwedê, aqubeta firewn were serê we û dewleta we."

Cendirma gotin "Mela kê bêje gundiyan bila ji me ra

hinek dewê sar bînin, em vexun, emê biçin gundê

han.

Dew vexwarin û birê ketin.

Mela zanibû hinekan şikayeta wî kirine, hima kê û çî gotine?

Roja din nîvroj mela liser ezanê bû, ezan dixwend.

Dema berê xwe da alî rastî got **"heyê**

alesselaaaaaaah," bala xwe dayê başçawiş bi tev

du cendirma way tîn

Mela hima ezan guherî, got:

“hayDin namazaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaa - haydin
namazaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaa
haydin kurtuluşaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaa - haydin
kurtuluşaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaa
Tanrı ulduuuuuuuuuuuur - Tanrı
ulduuuuuuuuuuuuuuuuuuuur
Tanridan başka tanrı
yoxtuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuuur”

Cendirme êdî hatibûn ber mizgeftê, lê ji ber bayê
deng baş neçûbû wan ka mela nivî ezanê bi erebî an
bi tirkî xwendibû.

Başçawiş got:

- Mela an te bi erebî ezan dixwend, dema te em dîtin
zivîrand tirkî

Mela got:

- Nexêr, ma deng nahat we?

Başçawiş got:

- Mela gundi dibên ku tu ezanê bi erebî dixûnî

Mela got:

- Na derewa dikin, ez piştî qanuna nû tim bi tirkî
dixûnim.

Başçawiş got:

- De baş e, ka ji me ra ezana sibê bixûne!

Melayê reben, nizanî ku herdu hevokên

(Esselatuxeyrun minnewm – Nimêj xêrtirê ji xewê ye)

ezana sibê wergerine tirkî, bo xwe xilas ke got

- Qumandarê min hun bawer bin ji wê rojê

şûnve min qet ezana sibê nexwendiye”

Başçawiş got:

- Mela hay ji xwe hebe, tu zanî me erebî rakiriye, ez ji

te şikayetek sehkim ezê te bi darda kim, me gelek

melayên wek te xaîn bi darda kiriye, tu zanî an na?

Mela got:

- Belê min sehkirîye.

Başçawiş got:

- Mela vê baş bizanîbin, Xweda jî em in, pêxember jî em in, em kê cezakin emê cezakin, em kê xelat kin emê xelat kin!.

Mela dengê xwe nekîr, pîrr xemgîn bû, di dil xwe de fikirî „**ger bekoyên me tunebana, ger wek gelên din yekitiya me jî heba, çim emê divî halî da bana?**“

Conî û dan

Dema dibû payîz gundiyên me tevdîra zibistanê didîtin. Zivistana, li welat gelek berf dibarî, rê û dirb dihatin girtin, pirr mirov hebûn ku şeş meha çavên wan bi bajêra nediket. Dê pêwîst bû ku tevdîra şeş meha bahata girtin.

Tevdîr çî bûn? Kesên heywanên wan heba kê û gîha dicivandin, mêngê wan heba diçinîn, hinekan gîha hûrdikirin dikirin kê. Van salên dawîn hima herkesî gîhayê xwe hûrdikirin dikirin kê, jiber hinek kesên nebaş gîha dişewitandin. Kesên mêngên wan tunebana an rûyê mêrga kirê dikirin an jî, ji xwe ra kê û gîha distendin, bi vî awahî tevdîra heywana dihat dîtin. Carnan ku zivistanê dirêj bikira hinek kes kê û gîhayên wan têr nedikir, kesên perê wan heba dikirîn, hinekan jî pezên xwe li cîrana belav dikirin heta çêre derketa. Hinek kesan jî pezên xwe dibirin welatê jêrîn, wek Riha û Amedê.

Lê tevdîra malbatî jî hebû. Ew jî bi gelemperî genim kelandin (Serhediya jê re bilxur kelandin digotin) û dan kutan bû. Çend torbe arvan, kartol, pîvaz û tenekên rûn, penêr û toraq jî nedihat jibîr kirin. Lê van salên dawîn gelek di şûna rûnê mal de yên sunî (serhediya runê vite digotin) distendin, jiber ew rûna him sivik bû û him jî erzan bû. Vana karên serbixwe bûn, lê genim kelandin û dan kutan pirrê caran cîrana bihev re alîkarî dikir. Wê biçuna devê çemekî, genimê xwe bişûştina, agirê xwe vêxistina, berôş û sîtilên xwe danîna ser agir, genim têxistinayê û bikelandina. Piştî kelandinê genim diperçivî, lê bi rastî dema ku hêj germ bû gelek tam jî têde hebû. Carnan cîranan ji cîranan re genimê kelandi diyarî dikirin, me jê re digot bilxur hêj ku nahatibû hêran jî.

Piştî kelandinê genim li ser qesîl û palasa radixistin. Dema baş hişk biba îja ew genima an dibû bilxur an jî dibû dan. Pirrê kesan 3-4 torbe bilxur çêdikirin û bi qasî torbekî ji dan. Lewra dan wek bilxur pirr nedihat xwarin. Bilxurê me him di şûna xwe de û him jî di şûna birinc de dihat bikar anîn. Bi rastî tama bilxur ji xwe ji birinc jî xweştir e, lê hinek kesên maldar birinc jî distendin, dema mêvan bihatina birinc meqbûltir bû. Boy vê jî hinek kesan xwarina bilxur biçûk didîtin. Ku dema hinekan liser nan û zadê wan henek bikirina digotin "**dinya nediya dinya nedî, bilxur dane ser gotin mala me eydî.**"

Destarê bilxur li welat berê du kevir bûn. Kevirê binî pîjek dixistin navê, yê ser jî nava wê de qulek mezin çêdikirin, genim berdidan nav û kevir digerandin, her wiha ew genimê kelandi hûr dibû û dibû bilxur, lê hurîkên wî jî çêdibûn, ji wê re jî digotin bilxurê hûr. Bi bilxurê hûr jî kifte çêdikirin.

Ji dankutanê re jî aşek hebû. Ew aş keviyekî mezin bû, nava wî derdixistin bi qasî tenekekî genim bikevê, jê re conî digotin. Conî ji kevirê nerm çêdibû lê her malek coniyê wan tunebû. Mirov dikare bêje di gundek biçûk de 2-3 conî ancex hebûn. Dûvre gazî ciwanên cîran dikirin û bi mêkuta ew genima dikutan. Bi gelemperî du heba bihev re li conî dixistin, du heb jî li dor conî rudiniştin, genim davêtin ber mêkuta, lewra dema bi mêkuta li conî dixistin genim belav dibû, carnan derdiket serlêva conî, ku tevlihev neba dan baş nedihat kutanê.

Li welatê me cîhki ciwana hevdu nasbikira tunebû, bes dawet hebûn, jixwe li welat pirrên ciyan govenda mêr û jinan jî cuda bû, ta van salê dawîn jiyana nû tevlihev kir!.. Ciyê duwemîn yê boy naskirinê conî

bûn. Ciwana dema dan dikutan bihev re sohbet jî dikirin, wisan dibû sedemê naskirina wan jî. Hinek caran jî liber conî ciwana quweta xwe diceribandin, bihev re diketin reqabetê, dema yekî mêkut li conî dixist yê din mêkutê xwe amade dikir, wisan yek wî yek yê din ta kîjan zû biwestiya. Xwarina wê rojê liser xwediye bilxur bû, hinekan merdî dikirin ji wan re cixare jî distendin, lê kesî boy vî karî ucret nedistend.

Hinek xwedanê bilxur jî mexsûs wan dikir reqabetê daku zûtirî danê xwe bikutin.

Dan kutan jî him ji kultura me ye, him jî karekî alîkariyê (Kollektivist) bû di nava cîranan de.

Hêka mirîşkê! (Malbata Kello û Silo)

Fatê, wê sibê li pûnika mirîşkan nihêrî, bala xwe dayê ku hêkek kê m e. Zanî ku hêka mirîşka belek e. Lewra mirîşka belek tim li koşê jor ê pûnikê hêk dikir. Sekinî heya nîvrê careka din çû pûnikê qontrol kir ku dîsa hêk tune.

Mirîşka belek carnan di ser dîwar da firdida û diçû baxçê mala Silo. We zenkir ku mirîşk çûye wir û li wir hêk kiriye. Dema derket ber derî, dît ku Aynur'a bûka Silo way li derva ye, gazî wê kir û got:

- Lêlê Aynûr mirîşka me li baxçê we hêk kiriye ka hêka me bişîne!

Aynûrê li derdor nihêrî hêk nedît, got:

- Fatê mirîşka we li vir hêk nekiriye, hêk li vir tune, pûnika me jî hêj dadayî ye, û mirîşka we nikare bikeve hundur.

Fatê xwe hêrs kir:

- Ma hun şerm nakin tenezulî hêkekî dikin, eyb e ji we ra, hunê bi hêkekî dewlemend bibin gelo?

Bi qêrîn û qerebalixiya herdu bûkan Silo ji mal derket gazî bûka xwe kir got „keçê ev çi hêk e hun li ser bihev nakin?”

Bûkê got “bavê Fatê dibê we hêka me diziyê.”

Silo pirr hers bû. Got “lawo em tenezulî hêka kesî nakin, tu me jî wek xezûrê xwe dizanî. Hun ji berê da diz bûn, gundî ji malbata we fêrî diziyê bûne, îja hun ji xelkê dikin diz erêêê?”

Siloyê rûsipî, temenê wi heftê salî, gerek bigota **“lawo hun herdu namûs in, ma ne eyb e hun behsa hêkekî dikin.”** Gazî bikira bigota **“lowo Fatê tu jî wek bûka min, wek qîza min î, ka were du hêka bibe berxa min, em cîranên hev in, ne ji bo hêkekî ji bo çêlekekî jî gerek em dilê xwe ji hev negrin û nekin xeberdan.”**

Silo vê ya fêm nekir, bi wî rûyê xwe yê sipî destek da bûka xwe û bi bûka cîranê xwe ra xeyîdî.

Aynurê; jiber ruyê Siloyê sipî deng nekir çû mala xwe.

Dema Kello dît ku bûka wî Aynur bi made û mirûz e, jê pirsî. Aynurê mersela hêka mirîşka belek jê ra got.

Temenê Kellô jî derdorê heftê da bû, wî jî fêm nekir ku bêje **"lawo ma ne eyb e, te ji bona hêkekî dile cîranê me şikênan, ka were em bi hev ra biçin mala Silo û jê lêborînê bixwazin, ma ji bo malê dunyayê mirov dilê cîranê xwe dihêle. Ew cîran jî ku Pêyxemberê me gotiyê hindik mabû ku biba warisê cîranê xwe!"**

Kello ji mal derket gazî Silo kir, got **"lawo derkeve derva, îro an Xwedê dide min an dide te. Hun him hêka me didizin him jî galgala dikin erê."**

Silo jî nemerdî nekir, derket û li rasta ber derê herdu rûsîpiyan bi ruyê hevdu girtin lihev xistin, jin û zarok û cîran ketin nava wan û ji hevdu qetandin.

Bi qêrîn û hewar û gaziya zarokan hemi gundî pê hesiyan.

Melê gund jî derket derva ji gundiyan pîrsî gelo ev çi deng e?

Gotin seyda Kello û Silo pevçûne.

Mela got "de ka em biçin nava wan, herduyan li hev bînin."

Mela bi tev çend gundiyan ve çûn wê derê, teko teko çûn mala herduyan, jixwe mala herduyan bihev va bû. Mela gelek xwe aciz kir, li herduyan jî heqaretê kir. Wan birin malên hevdu û lihev anîn. Dûvra gazî wan kirin, birin mizgeftê.

Roj roja Îniyê bû, mela pir hêrs ketibû. Mirov

gundiyeîn hevdu, cîranên hevdu, kurd û bira yê
hevdu yê musulman be, û mirov ji bona hêka mirîşkê
dilê hevdu bihêle!.

Mela derket ser menberê, berê xwe da gundiya û got:
Gelî gundiya! Di dîne me da, du mafên girîng hene.
Yek biratiya olî ye, yek jî mafê cîrantiyê ye.
Pêxemberê me (a.s.) dibêje ku „kî çi ji xwe ra
bixwaze, ewî ji birayê xwe yê musulman ra jî nexwaze
ewî îman naniye.“ Mana vê yanî gerek mirov hemî
bawermenda wek xwe bizanibe, ji çi aciz be birayê
xwe jî bi wî aciz neke. Di dayin-sitendina her tiştî de
mirov birayê xwe wek xwe bizanibe. Di derbarê
cîrantiyê da jî, Pêxembere me dibeje ku “Cebraîl wisa
li ser mafê cîrantiyê disekinî ku min zenkir wê cîran ji
cîran ra bike waris.”

Deka li me û li hale me binhêrin. Me tiştên mezin
derdaye û em bi tiştên pirr biçûk ra mijûl in. Namûsa
me bûye malê dunyayê, ji ber tiştê herî biçûk em
dikin hevdu bikujin. Gelo ku em cîran hevdu bikujin
wê kî bi ser me da bigrî? Me hêkek kiriye namûs ji
xwe ra. Namûsa herî mezin dîne me û welatê me ye.
Gelo ka ji bona dîn û welat çend caran me xwe aciz
kiriye? Bi sed sala ye welat di bin îşxalê da ye, bi sed
sala ye Ola (dîne) me jî hêdî hêdî hatiye rakirin, bi
taybetî va sed salên dawîn ne dîn hîştin ne jî welat,
hemî tiştên me qedexe kirin, mizgeftên me kirin tewla
hespa, hemî deşt û çiya yê me hatin gule barankirin,
bi sed hezaran kurd hatin kuştin, daristanên me hatin
şewitandin, dergûşa ber pêsirê jî hate kuştin, qet
xema we nîne. Hun hima karin bi hevra mijûl bin,
lihev heqaretê bikin, li ser hev mêraniyê bikin!
Mêraniya herî mezin gerek mirov ji cîranê xwe ra baş
be.

Biranô gerek em ji bo çar tiştan zêdetir ji hevdu
hezbikin
Ji ber ku em musliman û bira yê hevdu ne.
Jiber ku em kurd in û bira yê hevdu ne.
Jiber ku em cîran ên hevdu ne
Jiber ku em tev di bin destan da ne!
Heya ku em ji hevdu heznekin, em nabin birayê
hevdu, heya em nebin birayê hevdu em nabin xwedî
quwet, heya em nebin xwedî quwet em nikarin ji bin
zilma xelkê azad bin.

De îja bifikirin kîjan girîng e? Dîn û welat an hêka
mirîşkê?

Silo rabû ser xwe got: "Seyda ez ji te, ji hemî
gundiyan û bi taybet ji cîranê xwe Kello lêborînê
dixwazim. Bi rastî em pirr şûnva mane. Min pirr
kêmasî kir, me namûsa mezin hîştîye em li du netîşt
ketine, ez pirr xemgînim."
Di dundra Kello jî rabû wek Silo axivî, rûyê mela û
gundiya şên bû.
Pîştî nimêja Îniyê, çend rûsipî li cem mela man, gotin
mela ji vir şûnve emê hemî zarok û ciwanên xwe
teslîmî te bikin, tu ji kerema xwe ra wan perwerde
bike, wan bike xizmeta dîn û welatê me.
Namûsa herî mezin welat e, ku welat tunebe, ne dîn
dimîne ne namûs!

Ka Keleşkofa te?

Roj ji rojên meha Hezîranê bû. Li welat hewa gelek germ bû. Dem dema gîhaçînînê bû. Gundiyên hêdî hêdî tevdira gîhaçînînê dikirin. Germê erd zêft kiribû. Her gundiyekek bi derdê xwe ra mijûl dibû. Hin kes traktora wan hebû lê perê bidana heqê mazotê tunebû. Hin kes ne traktor û ne jî perê çinîna giha hebû. Ji xwe welat her dem di tengasiyê da ye, lê wê salê tengasî zêdetir bû.

Li qereqola nehyê başçawuşek û bi tev heft cendirma hebûn. Lê wek arteşek deh hezar hikmê wan hebû li ser gelê me. Di wan salan da forsa leşkera li welat pirr zêde bû. Başçawuşek bi tev heft cendirma dikaribûn wan hemî gundên li dor nehyê bicivandina û li wan gelek şikence jî bikirana. Ji xwe ki li hember wan derketa wek xainê welat bi wan ra miamele dihat kirin.

Belê rojek ji wan rojan, serleşker ket açxanê û ji aşpêj pirsî:

- Berxê min we îro çi daye ser? Emê vê nîvroyê çi bixûn?

Aşpêj: Wele qumandarê min îro tenê miqarne heye, ji alayê erzaq neşandin.

- Lo lawo ma dibe? Em ji welat ra xizmetê dikin û wiha birçîbin?

- Ka emrê we çiyê qumandan?

Bila du heb esker li vir bisekin, em yê din biçin gundê **Xeleka**, mala dewlemendek kurd, bila ji me ra xwarinê amade bikin.

Hey Durmuş û Barış hun li vira bin. Veli, **Kasim**, Ali, Yüksel, Memo hun jî xwe amade bikin. Kasim tirk bû ji Bayburtê, Memo (Memet) jî, ji hêla Botan bû Kurd

bû. Dilê Memo pirr dişewitî, çî be jî kurd bû, li ber wî bi van dek û dolaban kurd dixapandin, malên wan dixwarin. Wî tevî van eskeran li Serhedê, belkû yek kurdek esker jî, bi tev hinekan li gundê wan wiha qellaşî dikirin.

Qumandan (serleşker) bi tev van her pênc leşkeran berî xwe dan gundê Xeleka. Dema hatin ber gund jin û zarokan deng li hev kirin.

Cendirme hatin cendirmeeeeee, ka biçin ser mala kê, an kê bigrin gelo?

Edî zarok jî fêr bûbûn ku dema cendirme bihatina gund, tiştê xêrê tunebû. An bertîl distendin, an hinekan dest **kelepçe** dikirin dibirin. Hiç sucên wan tunebana jî Kurd bûn, ev tenê bes bû ji wan ra.

Ji xwe kurdîtî wan deman sûcek mezin bû. Niha jî, Kurdbûn suc nîne lê maf xwestin sûcek mezin e.

Dema zarokan li hev dikirin gazi, gund pê dihesiya û gundiyan tevdîrên xwe didîtin. Kesên ku çekên wan hebana çekên xwe vedişartin.

Her çiqas çek veşartana jî, ji ber hin fesadên gund, qereqola tirka bi hemî gundiyan dizanibû. Ki çî sîleha wî heye. Ji xwe mezinên me gotine „**kurmê dare ji dare neba dar pûç nedibû.**”

Qumandan mala Heso di ber çav da kiribû. Dema hatin ber derî, kire qêrin „herkes hazrola geçsin, elleri başinizin üstüne koyun, arama var” (Herkes amade be, destên xwe bidin serserê xwe, emê malê serobin kin, lêbigerin) Kesî nikaribû pirskirina „**gelo ma emrê lêgerîna we heye, an ne.**” Va pirs jî, sûcek mezin a bi serê xwe bû.

Jin, zarok bi tev mezinan destên xwe dan serserê

xwe. Heso axa dest li ser serî, hêdî hêdî ber bi qumandan hat. Qumenderim siz îçerî buyur et, biraz istirehet et, yorilmissiz burya qeder geldi, ben bir qehwe verem, sonra areme yapseq olmez mi?

(Qumandanê min, hun keremkin werin hundir, ewqas rê hun hatin, niha hun westiyane, ez qehwek îkramê we kim, dûv re dîsa hun dikarin li malê bigerin.)

Olmaz heso ağa olmaz, senin şikayetini etmişler, arama yapacaxiz. (Nabe Heso axa nabe, gilîyê we kirine, gerek em li mala te bigerin)

Temam qumanden gene areme yepersin qurban ema ewil istirehet et. (Temam qumandan dîsa li malê bigere, lê yekem hinek rûnê li rahetiya xwe binhêre, yanî bîhna xwe bide. Xaya Heso ew e ku qumandan bîhna xwe bide, belku Heso wî îqna bike ku dev ji keleşa Heso berde)

Qumandan serê xwe hejand, got baş e, emê rûnên lê gerek em mala te serobin kin.

Heso gelek dilxweş bû, lewra ku qumandan rûnê wê hinek nerm be. Heso dîsa bi hin nan û hinek rûşwet (bertîl) îja jî Keleşa xwe xilas ke.

Yüksel devê xwe da ber guhê Heso:

- „Heso ağa îro du roj e em birçîne, em ji bo we xizmetê dikin, ji qumandan ra pezek serjêke, belku mala te serobin neke.“

Heso ji dûh va bi pezek razîbû. Heso hima pez da serjêkirin, nanek xweş bo qumandan û leşkeran amade kir. Nanê xwe xwarin, çaya xwe vexwarin, cixara xwe dikişandin.

Heso çû destê xwe kir cêba qumandan bi qasê perê keleşê pere kir cêba qumandan.

Dema rabûn, qumandan got Heso axa, tu zanî li cem me tirka dibên qehwek 40 salî xatirê wê heye. Me nanê te xwar, qehwa te vexwar, loma jî em lêdixin diçin.

Heso axa gelek memnun bû. Qumandan ji xwe

memnûn bû. Lewra him nanê xwe xwaribûn, him rûşwta xwe sitendibû, çima memnûn nebe? Ne emrê serobin kirina malê hebû, ne jî jê ra derd bû. Derdê wi xwarin û rûşwet bû ew jî bi dest xistibû. Dema şûnve zivirîn qereqola xwe, Kasim got:
- Qumandanê min gelo ev tişt me kir rind bû?"
Qumandna hêrs ket, "law em ji bona wan xizmetê dikin, malê wan, canê wan diparêzin, ewqas heqê me di malên wan de heye.

Kasim got qumandanê min, em can û malê wan ji kê diparêzin? Yê li wan heqaretê dikin em in, yê malên wan dixûn jî dîsa em in.

Qumandan got:

- Berxê min tu van tişt nizanî. Vana kurd in û di xewda ne. Gerek mirov bi dara li wan xe û nanê wan ji destên wan bistîne. Ger vana hîşyar bin, bibin yek em li vira nikarin bisitirin. Me niha çî bi wan kir ji me ra kar dimîne. Gunê xwe bi wan neynin, kurd çî ji mirovatiyê fêhm dikin!

Memo kelogirî bû, hêsrana di çavan ra davêt. Di dilxwe da digot:

Ku em Kurd jî wek xelkê cihanê xwedî dewlet bûna, wiha nedihat serê me. Gelo çî dibe ku Kurd jî, ji hevdu hezdkin, yekiya xwe çêkin, li ser warê netewî bibin yek, bibin dewlet, serfiraz bibin wek xelkê cihanê. Ma ne bese ku em ewqas kolê xelkê ne!

* * * * *

Keçika Kurd

Çend roj berê, min telefîzyon temaşe dikir. Kalekî tırka ku dema qetlîama Dersimê da li wir esker bûye, wiha diaxivî. (1938-39)

Me li gundekî Dêrsimê agir berda malekê.

Ha ku min dît keçikeke 7-8 salî, bi lez û bez ji nava malê derket û agir bi kirasê wê bû, dixwest ji xwe agir xilaske.

Dema keçikê em (leşkerên Tirkîyê) dîtîn, careke din bi şûnde vegriya û çû nava êgir.

Em jî li wirê man heya ku hemî şewitîn, paşê jî xanî tepişî.”

Mela Îbrahîmê Mixakomê û Waliyê Mûşê

Min xwe negîhandê lê, rûsipyên me gelek behsa Mela Îbrahîmê Mixakomê dikirin.

Mixakom gundek li deşta Mûşê ye. Mela Îbrahîm jî melayê gund e. Dem dema medresa ye. Li her gundî mizgehftek, li her mizgeftî hucrek bo feqiyên heye. Hucra feqiyên bo mela jî, bo feqiyên jî, bo gundiyan jî pirr girîng bû. Ciyê tehsîla ilmê û zanîne bû. Heya carnan denbêj û sitranbêjan liser hucran sitran jî digotin.

Dema ez zarok bûm tê bîra min di govenda da kilama feqiyên digotin.
Can canê can, can canê can hucra feqiya mezin e....
Wiha dewam fikir diçû.

Dewletê dixwest ku Kurda bi awahê olî jî asîmîle bike. Boy vê medrese qedexe bûn. Di dema min dest bi xwendina medresê kir jî, ev qedexeya didomand. Dema cendirme bihatina gund, me ji tirsê pirtûkên xwe jî û xwe jî vedişart.

Belê nav û dengê Mela Îbrahîm li her derî belav bûbû. Fetwayên herî giran wî dida xelkê. Bo vê jî hurmet û rûmeta wî li cem herkesî hebû. Jixwe hurmeta ehlê ilmê li cem me pirr bû ta ku va sî salên dawîn wek afat bi ser me da hat û gelek rêxistinên dijîmîniya ol û oldaran kirin. Her çiqas îro ew jî poşman bûne jî, mixabin gelek texrîbat di dîne me da çêbû.

Walîkî nû hatibû Mûşê û pirr mereqa Mela Îbrahîm dikir.
Rojekê di trampêla xwe da diçû daîra xwe, Ajotvanê wî got „Walî Beg eva mirovê di sûkê da dimeşe Mela

Îbrahîmê Mixakomê ye!"

Walî mat bû ma. Lewra wî Mela yekê pîrr modern, bi taxima cilan bi qerawêt û bi fotêr xeyal kiribû.

Ma wê mirovek wek gundiya girêdayî, çawa ewqas nav û deng bida!

Jixwe mirovên aqilê wan di çavên wan da ye (wek walî) ilm û mirûwetê di cilan da dibînin.

Walî pîrr ecêbmayê ma. Ji ajotvan ra got bêje polêsa bila evî derhal bînin daîra min.

Polês çûn Mela Îbrahîm bînin, walî telefonê muftî kir anî cem xwe.

Dema muftî ket oda walî, dît ku Seydayê Mela Îbrahîm li piya sekiniye. Muftî destê Seyda girt û maç kir.

Walî ji muftîra got „ka vê melayê kurda îmtihan bike.“ Muftî, Mela Îbrahîm baş nasdikir, pîrr caran wî jî, ji Mela Îbrahîm fetwa sitendibû.

Muftî got: Walî Beg min efûke, ez nikarim ji vî alimê tiştan pîrskim û wî îmtihan bikim.

Wali got: „Heyra tu mufti yî ew mela ye lo çima nikari?“

Mufti got: „Wali beg ew alim e, ez muftiyê Diyanetê me, bi awahê ilmî ne heddê min e ez wî îmtihan bikim.“

Walî pîrr aciz bû li hember melakî kurd. Di dil xwe da got „Va çi mela ye kes nikare ku wî imtihan bike.“

Belku mufti jî kurd e loma naxwaze. Baş ew e ku ez mela îmtihan kim.

Paşê ji mela pîrsî:

- Mela şertên Îslamê çendin?

Mela got: Şertê Îslamê yek e.

Walî şaş ma, got çawa dibe, tu hêj şertê Îslamê nizani. Şertê Îslamê pênc in.

Mela got; na wali beg tu şaş î. Em herduk jî dibên em musliman in, lê yê te sewm û selat tune, ez jî feqîr im Hec û zekata min tune. Çi ma? Ma kelimeyê şehadet, yani yek!

Muftî got; wali beg bihêle bila Mela Îbrahim biçê, an ewê me herduyan jî rezîl bike.

Wali tişteşk fêşm nekîr. Got; mela şertên îmamê çendîn?

Mela got sisê ne.

- 1- Türk olmak (mirov tirk be,
- 2- Askerlik yapmak (biçe leşkeriyê bike),
- 3- Şapka giymek (Şewqe bide serê xwe)

Wali dîsa tişteşk fêşm nekîr.

Muftî got; wali beg bihêle bila mela biçê. Walî got baş e, fermo mela.

Mela derket çû. Wali ji muftî ra got ka bêje vî çû got. Eva çî mela bû, yekê dînîk bû? Ka çî mana gotinên wî hene?

Muftî got; na Walî beg. Wî ji me ra got ku: "Hun bi dev musliman in lê tenê kelimeyê şehadet tînin, wek din eleqea we Îslamê tune. Îmana we jî tenê Tirkîtî, kemalîzm û leşkeriya we ye. Hun ne musliman in, ne jî mumîn in, ka ezê çî bersiva we bidim, him van pirsana ne yêşn aliman e, vana zarok jî dizanin."

Wali got; Xwedêkîri me ew zû şand û êdî pîrs nekîr, an wê ji me ra gelek bida xebera.

Xwedê hezar rehma xwe li Seydayê Mela îbrahim bike.

Amin.

Pêkeniyên Gel

Muhammed Nureddin Yekta
tarih 010101 2018
Dortmund

M. Nureddin Yeğta kî ye?

Di 24.03.1957'an da li bajarê Mûşê hatiye dinyayê.

Di biçûktiya xwe da dest bi dibistana seretî û ilmê medresê kir. Piştî dibistana seretî di medresanda xwendina xwe domand.

Bi medresê ra jî, him lîsa Îmam-Hatîp û him jî Sosyal bilimler xwend.

Di 29.09.1978 di Diyanetê da dest bi wezîfê kir û di sala 1994'an da jî, dev ji wezîfa Diyanetê berda.

Di despêka sala 1997 derbasî Almanya bû. Ta niha bi sedan nivîsarên wî di qovar û malperên internetê da û heft heb jî pirtûkên wî hatine weşandin.

Pirtûkên wî:

- 1- Elifba Quranê û Tecwid (kurdî û erebî)*
- 2- Kuran Elifbasî ve Tecvit (türkçe ve arapça)*
- 3- Gundîyê (Helbestên xortanî)*
- 4- Sevdam bir güle (gençlik şiirleri)*
- 5- Pêkeniyên kurdî*
- 6- Ümmetin Mazlumlari kurdler ve Kurdistan*
- 7- İslam'da Irk sorunu ve kurdler*

